ARMANC
Ji mehê carekê dertê
Hejmar: 116
Gulan 1991
Buha: 15 Skr. 3 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly Kurdish Magazine
No: 116
May 1991
Price: 15 Skr. 3 DM

### Hêvî û endîşe

## Guftûgoyên otonomiyê wê heta kîngê dom bike?



*Talabanî û Seddam.. Maçikirina mirinê ye...ya.....?*

**Îro firsetek tarîxî ketiye destê Cepha Kurdistana Iraqê. Dewleta Iraqê gelek zeîf e û ya herî muhîmtir, ew ji cîhanê îzole bûye. Û wer xwiyaye heta ku Seddam li ser hukum be wê Ewrûpî û Amerîkî ambargoya aborî ji ser Iraqê ranekin. Ji aliyê din ve jî li cîhanê ji gelê Kurd re sempatiyek çêbûye û mesela wî ya adîl baş hatiye nasîn. Gelo Kurd û berpirsiyarên wan, wê karibin çiqasî ji vê îmkanê fêdê bibînin ?**

Heyeta Cepha Kurdistana Iraqê di bin seroktiya Celal Talabanî de -ku di heyetê de Samî Ebdurrahman, Resûl Mamed û Nêçîrvan Barzanî jî hebûn- di 24'ê Nîsanê de bi Sedam Huseyîn û bi berpirsiyarên hukumetê re rûrinştin û bi prensib li ser hin xalan li hev kirin. Li gor beyana Cepha Kurdistana Iraqê-Buroya Skandînaviya li ser çar xalan li hev kirine: Ev xal ev in: 1- Normalkirina rewşa Kurdistanê. Rakirina rewşa îstîsnaî û îcrayên raguhastin û rakirina qanûnên îstîsnayiyên zîndan û surgûnkirinê. 2- Yekbûna nîştîmanî Iraqê. Her du alî li ser bingeha sîyaseta yekbûna nîştîmanê Iraqê wekheviyeke temam û biratiya herdu netewan û prensîbên demokrasiyê li hev dikin. 3- Demokrasî û mafê mirovî. Azadiya bîrûbawerî û çapemî, azadiya partî, rêxistin û jiyana pirpartîtî, hilbijartina azad û di hilbijartinê de wekhevî ji bo hemû partiyan û jiyana parlementeriya rastî. 4- Mafên netewê gelê Kurd û beşdarbûna wî di birayan siyasî yên navendî de li Baxda. Qebûlkirina naveroka beyana 11'ê Adarê.

Celal Talabanî jî di presskonferansa çapemenî de digot "me li ser demokrasî û pirpartîtiyê, hilbijartineke serbest û azadiya çapemenîyê û kontrolkirina hatina petrola Kerkûkê li hev kiriye."

Piştî ku heyeta Cepha Kurdistana Iraqê ji Baxdayê vegeriya îcar heyetek di bin seroktiya Mesûd

*Dûmahîk. r. 11*


**Di guftûgoyên bi dewleta Iraqê re**

**Pêşniyara Cepha Kurdistana Iraqê ji bo otonomiya Herêma Kurdistanê**


rûpel 6-7

## Galayek muhteşem ji bo doza Kurdan

**Konser ji alî Xaça Sor a Navnetewî ve hat organîzekirin û bi riya televîzyona BBC li hemû dinyayê nêzî 400 milyon însanî îmkana temaşekirina vê konserê dîtin**



*Şivan Perwer û McHammar (li jor)*



*Yek ji beşdarê konsêra Stockholmê Lill Lindfors (li kêlekê)*
*(Foto: K. Reza)*

Ji bo alîkariya Kurdên Iraqê di 12'ê Gulanê de dengbêjên dinyayê yên herî bi navûdeng li Londonê li stadyuma Wembley konsereke muhteşem dan. **MC Hammer, Snap, Lisa Standfield, Gipsy Kings, Alison Moyet, Alexander O'Neal, Tom Jones û Chris DeBurgh** ji wan grûp û hunermendên ku di konserê de beşdar bûn hinek in. Ji aliyê din **Sting, Peter Gabriel û Sinead O'Connor** ji Den Haagê bi riya satelîtê beşdar bûn. Ji Hollandayê cardin **New Kids on the Block û Gloria Estefan** jî ji Roterdamê tevî vê kampanyayê bûn.

**Inx** ji Melbourneyê ji Awustralyayê, **Rod Stewart** ji Lousanne ji Îswîçreyê, **Paul Sîmon** ji Manchester û ji gelek ciyên din ên Amerîkayê jî **Whitney Houston, Yes Haland & Oates û Ryuichi Sakamoto** bi riya satelîtê wê şevê ji bo Kurdan stiran û piştgiriya xwe ya navnetewî nîşan dan.

**Rastiyê basît**

Kampanyaya alîkariyê di bin navê **"The Simple truth"** - Rastiya basît- de dom kir. Ev nav, navê sitraneke **Chris DeBurgh** e, ku wî ev sitrana xwe diyariya Kurdan kir û got, hemû hatina ji vê plakê bê, ezê hîbeyî Kurdên multecî bikim.

Konser ji alî Xaça Sor a Navnetewî ve hat organîzekirin û bi riya televîzyona BBC li hemû dinyayê nêzî 400 milyon însanî îmkana temaşekirina vê konserê dîtin. Li gor hesabên kesên organîzator, ji hîbe û ji bilêtên konserê, wê 20 milyon Sterlîn alîkarî kom bikin Ji vî 20 milyon Sterlînî, 10 milyonî, hukûmeta Engilîstanê hîbe dike.

Li gel ku ev konser li dinyayê ji alî 400 milyon însanî ve hate temaşekirin, li Tirkiyê nehat nîşandin.

*Dûmahîk r. 11*

### Stenbol

**"Komîta Hewldana Maf û Azadiyên Kurd" hat damezirandin**

Li ser bangkirina komek ronakbîrên Kurdên li Stenbolê dijîn bi armanca civandina konferansek fireh, 130 ronakbîrên Kurd li Stenbolê di 26 .05. 1991'î de di salona "Mulkiyeliler Birligi" de civiyan.

Ji beşdaran 22 kesî axaftin kirin. Digel dîtinên cihê, di riya civandina konferansekê de tevê beşdaran li hev kirin. Û biryar hat stendin ku piştî demeke hazîriyê, bi babeta mafên mirovî ya gelê Kurd konferansek bê amedekirin.

Di dawiya civînê de ji 20 kesan komiteyek bi navê "Komîta Hewldana Maf û Azadiyên Kurd" çêbû. Di nava van 20 kesan de A. Zekî Okçuoglu (abûqat), Parlamenterê HEP'ê M. Alî Eren, Gunay Aslan(rojnamevan), Umît Firat (weşanvan), Yilmaz Çamlibel (muhendîz) Fatma Karahan (rojnamevan) Mustafa Ozçelik(muhendîz) û Mustafa Aksakal (esnaf) hene.

## Rojeva Mehê

### Guftûgoyên Otonomiyê: Rastî û şaşî tevlîhev dimeşin

Piştî şikestina serîhildana gelêrî ya Kurdistana Iraqê û wê trajediya mezintirîn a dîroka Kurdistanê, serokên Kurdan li ser dawetkirina Saddam bi rejîma Iraqî re rûniştin, dest bi guftûgoyên otonomiyê kirin. Helbet ji bo Kurdan, hilbijartina dema guftûgoyan ne çêtirîn dem e. Piştî şikestinek wiha dijwar, gelo Kurd çiqasî wê karibin di bazarê de xurt bin? Lê li alî din Saddam bi xwe jî di nav rewşek gellek dijwar de ye. Erê bi wê êrîşa xwe ya hov, bi milyonan Kurd bi çol û çiyan xistin, lê problema Kurdî li ser serê wî dijwartir û girantir bû. Jê pêştir, piştî teslîmbûna rejima wî li hember hêzên mutefîkan, cih lê teng bûye, ketiye wê heyrê ku çawa dîktatoriya xwe li ser piyan bihêle.

Gava meriv van rewşan li ber çav digre, dixwiyê ku Seddam mecbûr bû ku pêşniyariya guftugoyê bibe ji Kurdan re. Kurd bi xwe jî di rewşek wiha de mecbûr bûn ku ji bo guftûgoyan bi rejîma Iraqî re rûnên. Ji bilî guftûgoyan tu çare nebûn, loma jî ev, gavek di cîh de bû.

Dicîhdebûna gavê ne ji wê yekê tê ku ev, wê bi xwe re demokrasiyek rastî ji Iraqê re û mafê otonomiyê ji Kurdan re bîne. Na, heta ku Saddam û rejîma wî li ser hukum bin, demokrasî nayê Iraqê û otonomî li Kurdistanê ava nabe. Dibe ku li ser kaxezê bê îmzekirin jî lê di jiyanê de ne mumkun e ku biserkeve. Çimkî biserketina wan, mirina Seddam û rejîma wî ye. Heta mesela otonomiyê ji vê jî wêdetir e. Carekê li welatekî wek Iraqê ji dîrok û kultura demokrasiyê bêpar şertê jiyandin û parastina otonomiyê hema hema qet nîne.

Dicîhdebûna gavê, ji wê yekê tê ku divê Kurd wextekê qezenckin, da vegerin bajarên xwe, ser erdên xwe, cî û warên xwe. Hetta ji hemû tiştî muhîmtir hêzên şoreşa Kurdistanê karibin milet li dora şoreşê bicivînin, rêkbixin û ji bo rojên dijwar ên demên nêzîk amade bikin.

Li alî din, qasî dicîhdebûna gavavêtina ji bo otonomiyê, ew qas jî awayên guftûgo û karûbarên li ser otonomiyê ne di cîh de ye. Şaşîtiya pêşîn ew e ku hêzên Kurd li Bexdayê bi rejîm re rûniştin. Bexda cihekî herî xeter û nemusaîd e ji bo Kurdan. Wan bi vê yekê xwe ji xurtiya bazarkirinê bêpar hiştine, vî çekî xistine destê dijminê xwe, manewiyata tavayiya Kurdan û raya giştî ya piştgir a tevgera Kurdî daxistine. Firsetdana wê şowa ku di televizyona Iraqê de li ser maçîkirin û hembêzkirina Seddam hat derxistin û beyanên hin serokên Kurdan li ser bawerpêanîna bi Seddam jî xizmeta wê yekê kirine ku li ber çavê dinyayê av li ser rûreşiya Seddam zelal bibe, awirên gurr ên raya giştî ya cîhanî ku li dijî Seddam bûn, sist bibin, baweriya bi serokên Kurdan biheje, têkoşîna Kurdan a li hundir û derveyî welêt û ya piştgiriya navnetewî ta dereceyekê sar bibe.

Bi van gavan, serokên Kurdan dane xwiyakirin ku, gellekî guh nadin psîkolojî, daxwaz û hêviyên Kurdan, yên raya giştî ya Kurdan û her wiha yên çapemenî û raya giştî ya cîhanê. Wan zêdetir xwest ku mesajê bidin Seddam û rejima wî. Lê eşkere ye ku Seddam bi mesajên wiha nerm nabe û dev ji planên xwe yên qirêj ên dijî Kurdan bernade.

Şaşîtiyek din jî heye ku ji hemuyan muhîmtir e. Piştî destpêka guftûgoyan, hema hema bêje hemû Kurdan kar û barên xwe dane aliyekî û li hêviya guftugoyan mane. Karê xebata aktuelhiştina pirsa Kurdî ya di raya giştî de sist buye. Ne xwiya ye ku civandin û rêkxistina gelê Kurd li welêt bi çi awayî dimeşe. Li welêt çi dibe, çi diqewime, ne bi destê Kurdan, lê bi destê biyaniyan digihê raya giştî. Tirkiyê dest bi planên li dijî guftûgoyan kirine, potansiyela Kurdan dikare rê li ber vê planê û yên wek wê bigre, lê tu gav ji bo lidarxistina vê potansiyelê nayê avêtin. Bi dehan karên din hene ku divên bên kirin, lê kes pêçîka xwe ji bo wan nalivîne. Bi kurtî îro demek wiha ye ku, ne roj lê seet û saniye jî gelek muhîm in. Her saniya ku bê amadekirin û kar û bar derbas dibe, ji kîsê Kurdan diçe. Û ya xerab gava ev kar û xebat nayên kirin, du guftûgoyan de bi xwe jî Kurd zeîftir dibin, îmkana diberxwedana rejim li hember daxwazên Kurdan xurttir dibe.

Bi vî awayî, mixabin ku rastî û şaşî mil bi mil tên meşandin, lê tehamula tevgera Kurdî ji xavîtiyên wiha re nemaye.

# Daxuyaniya civîna Stockholmê

Di rojên 3-5'ê Gulana 1991'ê de, ji hevalbendên Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdîstan (PPKK), Kawa, Partiya Demokrat a Kurdistan (PDKT), Partiya Hêza Welatparêz a Kurdistan, Partî Karkerî Kurdîstan (KİP), Partiya Rizgariya Kurdistanê (Rizgarî), Platforma Yekîtiya Ala Rizgariyê, Platforma Yekîtiya Şoreşger û Welatparêz ya Kurdistanê, Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê, Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê, Têkoşîna Sosyalîst û hin kesên din,-ji Kurdîstana Bakur- li dor 90 kesî, li Stockholmê civîyan. Di civînê de ew li ser rewşa Kurdîstanê, li ser pêwîstiya xebatek bi hev ra li hundir û dervayî welat, li ser Konferansa Netewî ya Kurdistana Bakur, li ser "Qanûna Terorê" û vegera welêt peyivîn, dîtinên xwe ji hev re gotin, munaqeşe kirin. Piştî sê rojên bi gotûbêjên musbet, li ser hin xalan li hev kirin û qerar dan ku li ser wan xalên ku li serê mutefik in, bi hev re kar bikin. Ji bo vê yekê jî komîsyonek di civîna Stockholmê de hat hilbijartin. Ew xalên ku civîna Stockholmê li ser biryar girtiye ev in:

**Biryarên Civîna Stockholmê**

1) Îro hewcedarîyek gelek mezin bi yekîtî û hevkarîya sîyasî ya netewî-demoktratîk, ya ku bikaribe tevgera Kurdîstana Bakur di nav xwe de bicivîne, stratejîyeke hevbeş diyar bike û gelê Kurdistanê temsîl bike, heye.

Beşdarên civînê di wê baweriyê de ne ku ji bo gihîştina vê armancê, divê partî û organîzasyonên me yên siyasî, komeleyên me yên civakî û rewşenbîrên me berpirsiyarîya xwe bînin cî. Di vê riyê de pêkanîna konferansa neteweyî ya Kurdistana Bakur bibe gaveke girîng. Ji bo amadekirina mercên pêkanîna konferansek weha, divê wek destpêk, Konferansa Kurdistana Bakur Li Derveyî Welêt bête çêkirin.

2) Divê li ser naverok û awayê Konferansa Bakurê Kurdistanê li Derveyî Welêt, hem li Swêdê û hem jî li welatên din li gel hêz û kesên ku di vê civînê de beşdar nebûne, peywendî bête danîn. Herwisa divê li welatên din jî civînên wek Civîna Stockholmê bêne lidarxistin.

3) Beşdarên civînê dê bi hev re bixebitin da ku li welêt yan jî li Tirkiyê navendeke (merkezeke) çapemeniya/weşanan ya neteweyî û demokratîk bête danîn. Herweha dê hewl bidin da ku di vî warî de xebatên heyî bigihînin hev.

4) Beşdarên civînê li ser damezrandin û bikaranîna platformên legal ên Kurdî, wek rêxistin û damezraweyên (muesseseyên) neteweyî yên siyasî, demokratîk, civakî, kîtleyî (cemawerî) û pîşeyî rawestiyan.

5)Beşdarên civînê dê hewl bidin, ku anti-demokratîkbûna "qanûna terorê" ya ku dewleta Tirkiyê derxistiye, deşîfre bikin û ji bo vê yekê jî xebatên curbicur li dar bixin.

6)Beşdarên civînê li ser vegera welêt ya bi awayekî birêkxistî (organîzekirî) sekinîn.

7)Ji bo piştgiriya tevgera Kurdistanê li welêt û ji bo civata Kurdî ya li derveyî welêt, ku hejmara wê ji nîv milyonî bêtir e, divê damezraweyên neteweyî û demokratîk ên navendî (merkezî) bên danîn.

8)Beşdarên civînê diyar dikin, ku divê tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd li derveyî welêt, ajans û bîroyên netewî yên navendî deyne.

Divê xebat bête kirin da ku rojname/kovarên Kurdan ên çandî, edebî û siyasî yên heyî (organên resmî yên hêzên siyasî ne tê de) bigihên hev, xurttir, dewlemendtir û pirrengtir bibin. Herweha, da ku tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd bikaribe dengê xwe bigihîne gelên cîhanê, îro hewcedarî bi bultenên enformasyonê yên bi zimanên biyanî (Îngilizî ûhwd.) hene. ❐

# Di civîna Navnetewî ya PEN'ê de Du biryarên piştgiriyê li ser doza Kurdan

**Biryarên civîna navnetewî ya PEN'ê ên li ser Kurdan; yek jê li ser êrîşa rejîma dîktatorî ya Seddam e ku bi qesda jenosîda gelê Kurd hat lidarxistin, ya duduyan jî li ser protestokirina qedexekirina ziman û kultura Kurdî ye li Kurdistana Tirkiyê ye.**

Di civîna nûnerên PEN'a Navnetewî de ya ku di 22'yê Nîsanê de li Parîsê pêkhat, li gel hin biryarên din, du biryar jî li ser rewşa Kurdan hatin girtin. Biryara yekê ku ji alî PEN'a Fransayê ve hat pêşkêşkirin, diyar dike ku civîn nikare li hember curmên li dijî însaniyetê û bi taybetî, yên ku ji alî Seddam Husên ve li dijî Kurdan pêk hatin bêdeng bimîne.

Civînê da xwiyakirin ku bala Sekreterê Giştî yê Netewên Yekbûyî û ya UNESCO'yê dikşîne ser wê rastiyê ku "hukumraniya dewletan çawa dikare bigihê jenosîdek wiha ku em hê nuh bûn şahidê wê", loma jî daxwaz ji wan kir ku konferansek navnetewî ji alî beşdarên ne-hukumetî ve bê civandin ku mesela hukumraniya dewletan bîne ser pirsa curmên li hemberî însaniyetê û tespîta hudûdên pêwîst bike ji bo parastina jiyan, kultur, ziman û edebiyata yên ku dibin qurbanên van curman.

Civîna PEN'ê ya Parîsê di biryara xwe ya duduyan a li ser Kurdan de ku ji alî PEN a Swêdî hatibû pêşniyarkirin, balê kişand ser qanûna Tirkiyê ku zimanê Kurdî qedexe dike, her wiha da xwiyakirin ku hejmarek zêde ya nivîskar, rojnamevan, weşanvan û edîtoran bi navê "aktîvîstên cûdaxwaz" tên îthamkirin û cezayê giran li wan tên birrîn, îşkence ji alî polîs û berpirsiyarên hevsan li wan tên kirin ku çima zimanê xwe yê Kurdî bikar tînin.

Civînê herwiha da diyarkirin ku biryara Tirkiyê ya rakirina hin qedexan ji ser zimanê Kurdî teqdîr dike, lê dide xwiyakirin ku mixabin ev hê gellek kêm in û guhertinên gellek piçûk in, hê maddên 26 û 28'an ên Destûra Tirkiyê li ser hukum in û zimanê Kurdî di resmiyetê de, di mehkeme û hîndekariyê de di civînên resmî û taybetî de qedexe dikin.

Civînê her weha kêfxweşiya xwe li ser derxistina qanûna "efuya" bi şert da diyarkirin û heyfa xwe bi wê yekê anî ku ne efuyek temamî û bê şert e. Civînê bangî hukumeta Tirkiyê kir ku ew hemû zîndaniyên Kurd ên ku ji ber bikaranîna zimanê xwe yê Kurdî hatine girtin, bên berdan, ku garantî bike da bikarhatina îşkencê ji holê rabe û çapemeniya Kurdî bi temamî serbest bibe.

**Redaksiyon:** M. Elî, Zinarê Xamo, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat S. Rêving
**Redaktorê berpirsyar:** M. Elî
**Berpirsiyarê beşê Dimilkî:** Malmîsanij

**Adres :** Armanc Box: 152 16 161 15 Bromma / Sweden

**Telefon** 46-08-803135 **Telefax** 46-08-801825

**Ansvarigutgivare:** Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

## Biryara Parlamentoya Belçîka

# "Divê ji bo pirsa Kurd konferansek navnetewî bicive"

**Parlamentoya Belçîkayê li ser pirsa Kurdan rawestiya û ji bo çareserkirina vê problemê li Tirkiyê, Iraqê, Îranê, Sûriyê û Yekîtiya Sovyetê hewcedariya konferanseke navnetewî, wek pêwistî diyar kir û biryar da ku ji bo pêkanîna konferanseke weha bixebite.**



*Parlamenterê Belçîkî; Hugo Van Dienderen*

Roja 29'ê Nîsanê, parlamentoya Belçîkayê rewşa Kurdan girt rojeva xwe û li ser pirsa Kurd munaqeşeyên kûr û dirêj hatin kirin. Parlamento gihîşt wê baweriyê, ku alîkariya însanî herçiqas ciyê kêfxweşiyê ye jî, lê ev alîkarî pirsa Kurdan çareser nake. Li aliyê din, pirsa Kurd ne tenê pirsa Kurdên Iraqê ye jî. Divê problema Kurdan li Tirkiyê, Iraqê, Îranê, Suriyê û li Yekîtiya Sovyetê jî çareser bibe. Di dawiya munaqeşeyên dûr û dirêj de parlamentoyê biryar da ku hukumeta Belçîka bi sifeta xwe ya Serokatiya Konseya Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî ya dewrî, ji bo pêkanîna konferanseke bi vî rengî hemû îmkanên xwe seferber bike.

Herweha parlamentoya Belçîkayê biryar girt ku mafên siyasî, civakî û kulturî yên Kurdan li Iraqê bê qeyd û şert bên dayîn. Ev biryar di roja 30'yê Nîsanê de di rojnama resmî ya Belçîkayê de derket.

Wek tê zanîn Parlamentoya Belçîkayê di 14'ê Adarê de bi pêşniyara Hugo Van Rampaey (Partiya Social-Chrétien), Hugo Van Dienderen (Partiya Kesk) û J. Sleeckx (Partiya Sosyalîst) li ser pirsa Kurdan biryarek din jî girtibû. Li gor vê biryarê; "Heta mafên gelê Kurd li Tirkiyê bi emniyet neyê dayîn, divê em li pêşiya endametiya Tirkiye ya Civata Ewrûpayê bibin asteng". ❐

### Li hember qatlîamên hov

# Me dengê xwe kir yek

**Piştî êrîş û qetlîamên ordiyên Seddam li Kurdistana Başûr û koçkirina bi milyonan xelkê sivîl bi alî "sînorrên Tirkiyê û Îranê" ve, ji alî Kurdan ve li gelek ciyên Tirkiyê û Kurdistanê gelek tevgerên protestoyê û kampanyayên piştgiriyê hatin çêkirin**

***Turcel Dîlan/Stenbol***

Di rojên pêşî yên êrîşê de parlamenterên HEP'ê (Partiya Gel a Kedê) Ahmet Turk, M. Ali Eren û wezîrê kevn Şerafettîn Elçî li Newyorkê li ber bîneya Netewên Yekbûyî (NY) sê rojan ketin grewa birçîbûnê. Li alî din Sekreterê HEP'ê Îbrahîm Aksoy, parlamenterê Qersê Mahmut Alinak parlamenterê Mêrdînê Adnan Ekmen jî li Tirkiyê tacegulên reş danîn ber sefaretxaneyên Amerîka, Çîn û Sovyetê û ew jî li ber van sefaretxanan sê rojan ketin grewa birçîbûnê.

Perçeyekî din ji vê kampanyayê, li Stenbolê ji alî ronakbîr û welatperwerên Kurd ve Komîteya Rawestandina Qirkirina Kurdan (Komîte) pêk hat. Komîte ji alî van kesan ve ava bû: Ahmet Zekî Okçuoglu (avûkat), Umît Firat (neşriyetvan), Hasan Denîz (tucar), Huseyîn Aygul (Endamê Komîta Komela Mafê Mirovan a şubeya Stenbolê), Salîh Bal (Mesûlê Kovara Medya Guneşî), Hîkmet Çetîn (Xwediyê kovara Deng), Riza Erdoğan (Xwediyê kovara Ozgur Halk). Komîtê, roja 5. 5. 1991'ê bi konferanseke pressê avabûna xwe îlan kir. Komîte, dûre bi riya îlanên rojnaman gazî li bîrûraya giştî kir ku divê her kes ji alî xwe de tevî kampanya alîkariyê bibe.

Şûbeya Komela Mafê Mirovî ya Stenbolê roja 6. 4. 1991'ê li ber Postexana Mezin bi beşdarbûna nêzî du hezar kesî civînek pressê çêkir û bi têlgirafekê bêdengiya NY protesto kir. Komîtê, di organîzekirina vê xebatê de jî bi xurtî cî girt. Kesên beşdarî vê civîna protestoyê bûn hema hema gişên wan Kurd bûn.

Komîtê bi riya meqbûzên ku dabûn çêkirin pere, kinc, tiştên xwarin û lixwekirinê û derman top kir û bi riya Komela Mafê Mirovî û rêxistinên din gîhand kampan. Bi pereyên ku hatibûn topkirin jî derman hat kirîn û teslîmî gelê me yê kampan bû.

Cardin, Komîtê roja 11'ê Nîsanê li Sultanahmedê li Parka M. Akîf Ersoy tevgerek rûniştinê çêkir. Li dora 1000 kesî tevî vê aktîvîtê bûn. Tevgerê seet ji 12'an heta 17'an ajot û gelekî bala milet kişand. Dengbêjê bi nav û deng Ferhat Tunç jî ji destpêkê heta dawiyê rûnişt û bi sitranên xwe yên Kurdî û Tirkî- tevger geştir kir. ❐

## Avabûna Qampan gelşê çareser nake

***R. Bayram. London***

Ji bo protestokirina qetlîama li Kurdistana Başûr di roja 20'ê Nîsanê de meşek hat çêkirin. Ji her çar perçeyên Kurdistanê nêzî 500 kesî beşdarî meşê bûn. Ji Kurdistana Tirkiyê hevalbendên Ala Rizgarî û yên Partiya Pêşeng bi hev re û bi şîara "Divê qirkirina li Kurdistanê bête sekinandin" meşiyan.

Parlamenterê Îngilîz Ceremy Corby jî tevî meşê bû û axaftinek kir. Wî di axaftina xwe de got, "qampên ku ava dibin nikarin gelşê çareser bikin, mesela Kurdan mesela welatekî ye, mesela tayînkirina qedera xwe bi destê xwe ye".

Li aliyê din di 1'ê Gulanê de jî gelek kes û rêxistinên Kurd, Tirk û Îngilîz bi hev re meşek çêkirin. Di meşê de rejima Seddamê dîktator hat protestokirin. Di vê meşê de jî hevalbendên Ala Rizgarî û yên Partiya Pêşeng bi hev re meşiyan û belavokek muşterek belav kirin. Di dawiya belavokê de ew wiha gazî hemû hêzên welatperwer dikin:

Divê em bi yek bin û li ber xwe bidin. Bi yekîtiyê em dikarin bendên mêtingehkariyê ji ortê rakin, Kurdistanê bigihînin azadî û serxwebûnê.

## NEYNIK

***Mehmed Uzun***

# TOLERANS

Gelo Kurdiya toleransê çi ye? Ez bixwe pê nizanim. Heye ku peyv û gotineke Kurdî di dewsa toleransê de hebe. Meriv dikare, bi-Erebî, jê re bibêje, "tehamul, musameha..." Yanî tiştekî ku ne bi dilê merivan be jî, meriv bikaribe qebûl bike, rê bidiyê, xweş bibîne. Meriv bizanibe ku ji daxwaz û dîtinên merivan pê ve jî dîtin, tevger, lebat û daxwaz hene û ew jî xwedî maf in. Di civatên pêşketî û demokratîk de, peyva toleransê mefhûmeke(consept) esasî û bingehîn e ku endamên civatê pê perwerde dibin. Peyva toleransê yek ji hîmên wan civatan e. Kes wê naleqîne û li dijî wê dernakeve. Ji ber ku herkes dizane, gava ew hîm bileqe, aheng û dûzana civatê û konsesusa di navbera çîn û komên civatê dê wê têk biçe. Civatê ji hêz û quweta xwe winda bike, dijîtî, hemberî û nakokiyên hundurî ku ji bo civatan birînên kûr in, dê pir zêde bibin. Sergêjî û perçebûnê dewsa zîrekiya civakî û entelektuelî û yekîtiyê bigire. Yekdengiyeke tarî dê dewsa pirdengiyeke rengîn bigire...û gelek bûyerên din ên nexweş...

Ji ber vê yekê ye ku merivên welat û civatên pêşketî toleransa şexsî û civakî mîna îmkaneke baş dibînin. Ne ku mîna xeterekê ku rê li pêşketinê digire.

* * *

Çima ez qala toleransê dikim? Du hevalên min ên hêja hene. Herdu jî, li welatê xerîbiyê, penaber in, ji Kurdistana Turkiyê ne, ronakbîr in, ji bo welat û gelê xwe gelek tişt kirine û her dikin jî. Ji ber xebatên xwe û daxwaz û armancên xwe, ew nikarin vegerin welêt. Ew di nav hesreteke zîz, di salên xwe yên 40-an de, dijîn. Bi gotineke din, hema çi bigire, qedera wan mîna hev e. Lê belê, wekheviyên wan jî heta vê derê ne. Ji vê derê û pê ve, ew ji hevûdu pir cihê ne.

Yek ji wan pir ciddî ye, bala xwe pir dide ser rabûn û rûniştinê, pir bi dîqet dipeyive, her gotina xwe bi caran dipîve û paşê dibêje, ji lêkolîn û lêgerînan hez dike, analîz û nêrînên tarîxî, fikrî, felsefî jê re pir girîng in, ji siyasetê û tevgerên siyasî hez dike, bi disîplîn û terbiya siyasî bawer e, têkiliyên wî bi tevgerên siyasî re xurt in, hemû belavok, kovar û weşanên wan dixwîne. Lê hema çi bigire, li dervayî jiyana Ewrûpê, di taxeke dervayî bajarekî mezin, di nav Kurdan de dijî, her gav dere civînên Kurdên penaber, lê tu carî nare civîneke ewrûpî.

Yê din xweşsohbet e, ji henek û qerfan hez dike, zêde guh nade rabûn û rûniştinê û paşgotinan, pir spontant dipeyive, hazircewab e, li gora her rewşê gotinên wî hene, pir bi hêsanî dikare bi her celeb merivî re bipeyive pêwendî deyne, bala wî li ser tiştên rojane ye, ji analîz û nêrînên kûr direve û henekên xwe pê dike, ew û siyaset pir ji hevûdu dûr in, belavok û kovarên tevgerên siyasî naxwîne û wan pir biçûk û nizim dibîne, eger pir ne pêwist be, nare civînên Kurdan, bi azadî û serbestiya şexsî û kabîliyeta şexsî bawer e, merivekî nerm e, pîvanên demokrasiyê û demokratbûnê jê re pir girîng in, di kar û xebatên xwe de jîr e û li gora xwe pir tiştî dike û diafirîne. Li Ewrûpê, di navenda Ewrûpê de dijî, ziman hîn bûye, bi hêsanî dikare bi Ewrûpayiyan re bixebite, têkiliyên wî bi dezgeh û sazgehên ewrûpî re xurt in, berpirsiyariyên wî hene...

Yanî du merivên ku ji hevûdu pir cihê ne. Qisûr û kêmanî di vê yekê de nîn in. Meriv ji hev cihê ne. Lê kambaxî ew e ku ev herdu hevalên min qet bi hev ne qayil in. Herweha ew ji hevûdu hez jî nakin û nikarin tu carî bi hev re bixebitin jî. Yek ji yê din re dibêje "qeşmer û sivik", yê din jî jê re dibêje "paştemayî û hov". Herdu jî van wesfên hev ên ku ew jê hez nakin, derdixin pêş û rexne li hev digirin. Bi vî awayî, dijîtiyek, berberiyek di navbera wan de tê pê ku tesîra wê qet ne baş e.

Ma ev herdu heval, eger em wan gotinên vala mîna "qeşmer, hov..." li aliyekî bihêlin, hevûdu temam nakin? Ma wesfên cihê yên van hevalan bigihên hev, hingê hêz û quweteke çêtir û berfireh ê neyê pê? Ma dewsa dijîtî û berberiyê, germahî û tolerans di navbera van hevalan de hebe, hingê feyda wan ê ne zêde be? Ez, pir caran, bi awayekî basît, weha difikirim.

* * *

Heye ku ez çewt im, lê ez bawer dikim, ev bêtehamulî û nerazîbûna ku ez bi mîsaleke şexsî tînim zimên, di her aliyê me û civata me de heye. Bêtehamulî û ji toleransê dûrbûn, ez bawer im, yek ji wesfên me yên esasî ye. Dewsa ku em hevûdu bi alî û wesfên xwe yên taybetî qebûl bikin û dan û standinekê li ser wê ava bikin, em dixwazin yên din jî *mîna me bin*, mîna me bifikirin, bipeyivin û tevgerên xwe bi rê xînin. Çi şexsî û civakî, çi siyasî û entelektuelî. Gava ew ne mîna me bin, hingê ew ne dost û hevkarên me ne jî... Ma ev ne yek ji wan sebebên paştemayin û jihevketîbûna kurdan e?

Ji lewre, eger gotina toleransê yan jî hemberiya wê ya Kurdî, bikeve nav zimanê me yê rojane û bibe kevirekî esasî yê stûna tevger û fikrên me yên şexsî û civakî, hingê dijîtî û berberiyên me Kurdan jî dê kêm bibin. *

*Ez ê demek dirêj ne li Swêdê bim. Ji ber vê yekê, mixabin ku ez ê nikaribim van nivîsarên xwe yên "Neynik"ê bidomînim. Ez spasdarê hevalên Armancê me ku fersend dan ku ez, bi gotinên xwe yên basît, bi we xwendevanên xwe yên hêja re bim. Di xweşiyê de bimînin...

## RAMANÊN RAMANWERAN

**Li ser guftûgoyên otonomiyê me ji hinek rewşenbîrên Kurd dîtinên wan pirsî. Lê mixabin ji 15 ronakbîrên ku me ji wan pirsî, bes 3 kesan bersîv dan.**

# Di her şertî de bi dijmin re rûniştin ji aliyê exlakî û siyasî ve jî ne rast e!

***Îbrahîm Guçlu***

Wisa dîyar e ku, teklîfa lihevhatinê ji Seddam hatiye û sedem jî ev in: 1) Li Başûrê Iraşê muxalefet şikandibû. Li Bakûrê Iraqê jî, gel welat valakiribû û tevgera Kurd derbeke mezin xwaribû. Seddam, bi vê xwe xurt didît û dixwest Kurdan bikşîne ser masê. 2) Dervayî Seddam, ji bo Hêzên Hevkar alternatîva siyasî ya Ereb tune bû. Lê, Hêzên Hevkar jî, bi vî halî Seddam qebûl nedikirin. Seddam jî didît ku Hêzên Hevkar ji bona wî helwişînin hewil didine. 3) Seddam tê gihêştibû ku, eger li Iraqê guhertineke piçûk be jî çêneke, di "nîzama nû" de nikare bijî. Ji bo vê jî, çareserkirina pirsa Kurdan bi awayekî pewîst e. 4) Seddam dixwest ji amborgoya FN'ê xwe xelas bike. 5) Hesab dikir ku muxelefeta Iraqê perçe bike.

CKI'ê jî, girêdayî sedemên rojane, kete nezertengiyekê û ji daxwaza Seddam re got **"erê"**. Sedem jî ev bûn: 1) Seddamê Ereban bişîne Kurdistanê û li Kurdistanê Erebbûyinekê destpêbike, ew jî ji pêşerojên Kurdistanê re nebaş û tehlûkeke mezin e. 2) Hêzên Hevkar çawa be jî, alikariyê nakin, alternatîva Seddam jî di nav Ereban de nîne; Hêzên Kurdistanê nikarin bi serê xwe dewleteka serbixwe jî ava bikin û xwediyê vê stratejiyê jî nînin, dinya jî ji vê re ne amade ye. Wê demê, baştire ku bi Seddam, bi "birayên xwe yên Ereb" re, pirsê çareserbikin.

Dema ku CKI'ê ji danûstandinê re got erê, li hemû beşên Kurdistanê û taybetî jî di nav Kurdên Başûr de kîn, nefret û dijminatiyeke gelek xurt hatibû ser pîya. 2 mîlyon Kurd, li çiyan û li tixûbên Tirkiye û îranê, di nav êşeke gelek xurt de bûn. Di rojê de, bi sedan zarok, jin û mêr; kal û pîr dimirin. Hemû dinyayê jî lanet li Seddam dibarand û bi pirsa Kurd re mijul dibûn.

Bi taybetî ew ûsluba danûstandinê, maçkirina heyeta CKI û Seddam, ji bo dinê gelek balkêş bû; di telewizyon û rojnameyên xwe de, bi maneyeke mezin ew tabloya dîyarkirin. Gelê Kurd gelek êşiya û eciz bû. Bi vê jî derket holê ku, hêzên welatperêz zêde hesabê gel nakin. Ji bo vê jî, psîkolojiya gel ji bo wan girîng nîne: Dema ku xwastin û di her şertî de dikarin bi dijmin re rûnin. Ev jî encameke baş û tabloyeke xweşik dîyar nake. Ew bûyera bi serê xwe jî, bê wext û şertiya; bê metodiya danûstandinê diyar dikir.

CKI'ê, enternasyonalbûna pirsa Kurd, baş bi kar nanî. Ji bo vê jî, di destpêkê de, piştgiriya Hêzên Hevkar û FN'ê hewce nedît. Bi vê jî dibûn sedem, ku pirsa Kurdan bikeve çarçeva Iraqê. Lê şertên dinyayê û "nîzama nû" ya ku tê avakirin, pêşiya vê digre. Ew tiştekî pozîtîv e.

Ji bo CKI'ê îmkanên mezin çêbûn, lê, bi kar nanî; ji zeîfbûna Seddam îstîfade nekir; beriya ku bi Seddam re rûne, şertên xwe pêşve najot. Şert dikarin ew bûna: 1) Terkkirina leşker ji Kurdistanê, 2) Serbestkirina girtiyan, 3) Vegera Kurdan ser erdê xwe, 4) Li derva, di bin gerentiya FN'ê de danûstandin kirin, 5) Ji Seddam, bi resmî îlankirina peymanxwastinê..

Gora xeberên radyo û rojnameyan, ev danûstandina dom dike. Gelek vekirî ye ku bi Seddam bawerî nabe. Hem dinya û him jî gelê Kurd, ji danûstandina otonomiyê hêviyeke mezin nake. Heta ji danûstandinan encamek jî derkeve, di vê sîstemê de, bi mantiqa Seddam, umrê encamê, dûr û dirêj jî nabe. Ji bo çareserkirina pirsa Kurdistanê, li Iraqê guhertineke esasî pêwîst e. Ew jî, rejimeke demokratîk û dewleteke federatîf e. ❑

# Guftûgoyên otonomiyê encama bêkesî û bêçaretiya gelê Kurd e

***Ehmed Rêbaz***

Bi ya min tiştek jê xemgîntir û nexweştir nîne ku nûnerên Cebheya Kurdistana Îraqê li gel qatilekî wekî Seddam, li gel dîktatorekî ku gelê Kurd çend caran bi destê wî hatiye qirkirin, guftûgoyên "otonomî" yê bikin. Bûyareke xembar e. Rewşa gelê Kurd û ya Cebheya Kurdistana Îraqê xembar e.

Qirkirina li Helebçê û yên vê dawiyê xuya kirin ku otonomî ne çare ye. Ji gund û malên xwe muhacirbûna bi milyonan, di bin bombaranan de û li ser sînoran qurbanbûna bi dehhezaran Kurd, eşkere kir ku otonomî ne çare ye. Otonomiyeke pêşeroja wê şêlû ne berdêla xem û jana ku bûye para gelê Kurd e. Kî ne astengên li pêşiya çarenivîsa gelê Kurd. Kî ne astengên li pêşiya danana dewleteke Kurdî. Divê bersiva rast ya vê pirsê bête dîtin. Yan ne wê dawiya xem û jana neyê û otonomî wê her wek çareya bêçaretiyê li dest me bimîne.

Dema Celal Telebanî ji Bexdayê vegeriya, li Şeqlewayê got: "Em bêkes in. Dostên me nînin." Gelê Kurd ji alî nufûs, hebûnên maddî û teknîkî û piştgiriya derve ve ji dijminên xwe bê hêztir e. Eger guftûgo pişta xwe nedin garantiyên qayîm, rastî xuya dikin ku wê peymanên otonomiyê bibin maka ziyanên nû. Bi gotineke din, tehemula gelê Kurd nemaye ku bi "çewtiyên nû" careke din bê xapandin. Çewtiyeke biçûk ji bo Kurdan dikare bibe sedema felaketeke mezin. Divê nûnerên gelê Kurd vê noxtê ji bîr nekin!

Seddam xwediyê polîtîkaya tuxumperest e, ya ku armanca wê qirkirina gelê Kurd e. Wî ji bona nehêlana me tiştê ji destê wî hatiye, texsîr nekiriye. Li gor encamên tecrubên gelê Kurd li gel Seddam û rastiyên jiyanê, mirov dikare bibêje ku dijminekî ji wî bêbextir û bê şereftir peyda nabe. Kes nikare baweriyê bi gotina wî, yan bi peymaneke ku îmza wî li binî hebe, bîne.

Tevî van rastiyan, tevî maç û mûçên ku ji qehra me radikin ser piyan, bi ya min guftûgoyên otonomiyê encama bêkesî û bêçaretiya gelê Kurd e. Ji ber vê yekê jî ez guftûgoyên otonomiyê yên Cebheya Kurdistana Îraqê normal dibînim û piştgiriyê dikim. Lê bêyî ku mafên gelê Kurd bên stendin, bêyî garantiyên qayîm, îmzekirina peymanekê bi ya min ne rast e. ❑

# "Di polîtîkayê de kîn nabe, polîtîka lihevkirin e"

**Orhan Kotan**

Hîn ne xuya ye ka tevlîhevî, kaosa li îraqê wê kengî, çi cur encamên siyasî û civakî bi xwe re bînin. Tevlîhevî çi bigre gelê Kurd giş xist ser riya muhaciriyê. Di rewşeke weha de ne xerîb e ku Cebheya Kurdistanî bi hukûmeta merkezî re dest bi guftûgoyan kir. Di polîtîkayê de kîn nabe. Polîtîka lihevkirin e.

Divê neyê ji bîr kirin ku gelê ku nikare ji miriyên xwe re cî peyda bike, li ser sînoran ber bi nemanê ve diçe. Di vê rewşê de guftûgoyên otonomiyê encama mecbûriyetê ye. Mirov dikare li ser hesabkirina dema guftûgoyan munaqeşê bike. Her weha wek çareyeke siyasî otonomî di esasê meselê de ne problemek e. Esasê meselê encamên siyasî û bi taybetî jî yên civakî ne ên ku wê ji van guftûgoyan derkevin.

# Axx Kurdê!

**Ehmed Huseynî**

"Taha! Helepça te ya biçûk va ye di gaza seqemê de mezin bûya!"

Wusa bi xwînê lê Kurdê! Li ser eniya te, li ser paniya te, li ser kevirên kaniya te, nivîsîne. Şev û şivanên tariyê bûne para te. Ji mêj ve lê Kurdê! Balgeha te ya ji perikên tirsê di bin serê ceng û talanan de bi xwêdana biyaniyan rizya bû. Her ku dengê te bi çivçivîkeke zelal ji hêlînên rojhilat hildihat, berê bahoza reş didan te û bazdidan ser xewna te ya tirsiyî yî, ya ku di astenga jînê de bi du çavên vekirî, bi du libên tirî ji xebxeba Mûşê, haşdibû.

Ji ZÎNFON de xelxalên te di lûla lingê demê de asêbûyî ne û tu jî di hêviyên bav û bapîran de mîna kevokekê û destanên girî, asê dibî. Dihatin û te lingên çiyan didan ber wan. bi ser dev û gullên xwînê de diketin, te singa xwe ya ji berfa pîroz ji nêrînên tolaz û serbazan diparst.

Dihatin.....Armanc keziyên zêrîn in ên berbanga te, ku di mijankên esman de mîna agirekî mecûsiyan xwe li ba dikirin. Dihatin û dilê te yê bi qebqeba kewan û fîxana bilbilan pêçayî, bi dû xwe ve mîna ewrên miştbaran dikişkişandin. Kî dihat, xencera xwe bi canê te disû! Kî dihat, kotîbûna ramanên xwe bi xwîna te derman dikir! Kî dihat, darên hinaran ji bo lidarxistina govenda mirnê ji te re dikirin sî û sîwan.

Ax lê Kurdê!

Rojnama bi şûr û mertalan dihat qulipandin, karwanê guran bi serjêkirina te bîna xwe digirtin, mêrgên dilê te ji ken û laqirdiyan rût dikirin û ji nişka ve, xwe dispartin axîna te. Axa te ya bi êrîşên biyaniyan hatiye rengorengo kirin va ye dilgiran û radest e.

Koç e, Kurdê koç e!

Te ji zozanan berî dida germyanan, beranê enî sor, lehengê kêrî ye, zinge zing bi roava dikeve, şevên sipî li dor te mexel tên, keldûman ji cifnî û ji heyva çarde şevî hiltê, tu mastê xweşiyê dimeyinî, bîna zagirê te avê bi zimanê biyaniyan dixîne. Bilûra te stêrkên dilrevînîyê bi ponijandinê din û xumîne. Te konê xwe ji porê NEMRÛD dirist, tu li bejî û destên aramê digeryayî û te stûnên dîrokê di alûşka QENDÎL de dikuta; ta ku te koça dawîn di dilovaniya çiyan de vegirt, hezar lehiyên xwînê, hezar kuştin û sersaxî ji gurçikên felekê derketin. Lê belê gezo reş bûye û xwe bi çermê dilê te ve şêrêz kiriye.

Lê KURDÊ, derdê te giran e,

Kî dikare ji nuh ve bîne ser zimanê xwe!?

Kî dikare ji nuh ve navê te ji dilê xwe bixîne!?

Dayika te li pişta te ye, dergûşa te li kolinga te ye, sînor di destê te ye û bejna te ya şitla ti'okê bi nifirek mezin matmayî maye.

Û tu li jor temaşe dikî. Xwedanê te bi hûnandina weranên te daketiye. Tu li teyrên ebabil dipirsî û hemû teyrên te baskokirîne û hemû tiliyên QENDÎL di vê seqema har de navnîşanên girî û hewarê li ser çermê te dikolin. Tu tî yî, birçî yî, seqem derbasî rewanê te dibe û xewa te nayê, xewa birîndaran tê, lê ya te nayê!

Lê KURDÊ, tu yê bi keservedanên kûr bibî navmaliya cîhanê. Tu yê bibî naverok û tovên vê şevreşa deyûz. Tu yê bibî manşetên mezin di rojname û nûçeyan de. Tu yê bibî mijar ji bo gazinên giyan û nimêjan.

HERODOT pênûsa xwe ji yadigariyên te didizî û li zinarên te ewle nedibû, xwe davêt bextê KARDOX û KÛTIYAN ta ku bi dengê silavan pêşgotineke dîrokî biafirîne.

Wusa tu dixulxulî, wusa firtone li te radibû û koçbariyeke nûjen e. Û hê te bawer nekiriye. Esmanê te bê quling û başok û qîjalk, dengê te zirav û kela girî di gewriya çiyan de ranaweste. Darbest di hûçkên te de rêz dibin, axîna te mêşinî ye, birîna te fireh dibe, herçar sînorên bi rocî li hev mikur tên û qîjînî bi Ferat dikeve.

Tu dipirsî:

Ev çi deng e vê sibehê gulan ji xewnê şiyar dike..?

Ev çi reng e vê sermahê li ser çeman diyar dike..?

Ev çi cenga gunehkar e ku goristanan pirr dike..?

Ev çi ewrên çep û rast in ku ji koloza çiyan bazdidin..?

Û KURDÊ!

Rondikên te ne, xwe çem dikin bêdengiya vê biyaniyê, her tişt zuha dibe, lêv û çav, dil û şev dibin porkûrî û kul. Ne derdê te dawî tê û ne jiyana me bi pêş dikeve. Tu di quntara çiyê de pêderiya mirinê dikî. Û ez di quntara xwe de li birçîbûna te temaşe dikim. Tu, dilhişkiya BÊXÊR dikî balgeh û bi çermê QENDIL ji bayê kurr diparezî û ez li kuçe û kolanan bi wêneyên mirina te, sermest û dîn dibim:

Lê KURDÊ!
Tu ê bi av bî an bi girav bî
Tu ê bi ar bî an bi buhar bî
Tu ê bi ax bî an bi qonax bî
Tu ê behişta heyîna min bî,
an doşha neyîna min bî
Tu ê gera destar bî
Ey Reqîba DILDAR bî
Qaş û morî û serdar bî
an ben û sêdar bî
Li xewna min siwar bî. ❑

www.arsivakurdi.org

JI DIZAN RE GOT HÛN DIZIYÊ DIKIN

# Ji Tirkiyê hat dersînorkirin

Esker û personalên Tirk ên ku di karê belavkirina erzaqê multeciyan de wezîfa girtibûn di nav çend rojan de bi diziyê bûn milyoner. Li gor îfadeyên multeciyan û muşahada hin rojnamevanên biyanî, eskerên Tirk erzaqên ji multeciyan re tên, li wan belav nakin, didizin û dûre bi peran difroşin. Li Tirkiyê û li Ewrûpayê hin kovar û rojnaman ev diziya personal û eskerên Tirk eşkere kirin û bêdengmayîna hukûmetê li hember vê diziyê jî rexne kirin. Muxabirê me yê Çolemêrgê C. Rojen, çend bûyerên ku ew bi xwe bûye şahid wiha rêz dike:

1. 4. 1991 li çiyayê gundê Bilêh min bi çavê serê xwe dît ku çawa şoforê ambûlansê (plaka ambûlansê 66 AD 185) derman bi peran difrot multeciyan.

-Eskerên Tirk, tasek av bi 5-10 Dînarî difrotin.

-Milîsên gundan çewalek nan bi 5-6 kelenşînkofa didan.

-Eskerên Tirk dest dabûn ser hemû erzaqî. Ji 350.000 kesî re ji sibê heta êvarî du terextor erzaq dişandin. Û kesên dihatin erzaq jî baş kotek dibûn.

Kurdekî li Swêd dimîne ku çûbû ser sînor ba malbata xwe, weha dibêje:

-Piraniya tiştan li ber çavan ji alî personal û eskerên Tirk ve dihatin talankirin. Yên mayî jî, zêde zêde û him jî tiştên herî baş didan Tirkmenan. Çimkî qampa wan cihê bû.

Muxabirekî din, N. Bozkurt dinivîsîne:

Çend rojan berî eydiyê û çend rojan jî piştî eydiyê ew tiştên ku xelkê dianî bi emrê qaymeqam û amirên din hatin depokirin. Her roj zêdeyî 10 kamyon tişt tên Çelê(Çukurca). Hin qamyon, li ber qonaxa hukûmetê tên sekinandin, hin jî diherin depoyên Tabûra Komando, depoyên bînaya hukûmetê û yên mekteba herêmê. Nuha xwarin û maddeyên din ên di dêra Çukurcayê de di navbera 30-40 tonî de ne. Du bodrum û sê embarên li pişt bîneya hukûmetê 10 kamyon xwarin û bataniye henin. Vana ji alî komîta gel ve tespît bûne. 18 kamyonên barkirî jî ji serê heftakê ve ye li ber bîneya hukûmetê ya Çukurcayê hatine sekinandin.

Mesûlekî ji komîteya Wanê dibêje: "Nuha hejmara betaniyeyên hatine stokkirin di ser 300 hezarî re ne. Nan, giş di depoyan de giş kufukî bûn".

Roja 16'ê Nîsanê jî heta êvarî pan, lê cardin tiştek bidest nexistin. Milet hewl dide ku bi Dînarên di destên xwe de hin tiştan bikire. Lê fîyet bilind e û Dînar jî bi 500 Lîreyî hûr dikin. Ji alîkî de jî alîkariya ji gel tê, polîs difroşe multeciyan. Ji Çukurcayê Mustefa Şîmşek dixwaze ji malbateke multecî re çadirekê bikire. Dibêje, "li ber bîneya hukûmetê polîsekî resmî çadirek bi 250 000 firot min".

A rojnamevanê Îngilîz Robert Fîsk di rojnama xwe Independent de qala van bûyeran kiribû û gotibû ku "eskerên Tirk talan dikin". Li ser vê yekê rabûn Robert Fîsk bi qerepereyeke mezin ji Tirkiyê derxistin û mesele kirin wek heqareteke mezin li Tirkiyê. ❑

# Sahneyek ji kampa Işikverenê

**C. Rojen/ Çolemêrg**

Wexta ku Kurdên Kurdistana Iraqê ji ber wahşete hov a Seddam reviyan û berê xwe dan "sînorên" Tirkiyê, bi deh hezaran ji wan hatin çiyayên gundê Işikverenê. Eskerên Tirkiyê nehiştin birayên wanê Kurdistana Tirkiyê alîkariya wan bikin û alîkariya ku hatibû berevkirin jî nedidan wan.

Bi fakta rewşa kampa Işikverenê;

1- 1'ê Nîsana 1991'ê- Li çiyayên gundê Işikvernê, memûrê sihî Metîn (ji Mûşê) ku pîlaqa tirimbêla wî 66 AD 185 bû dermanên ku ji penaberan re dihat bi peran (dînarên Iraqê) difrot wan. Pakêtek cixara Maltepe bi 15 000 difrot.

2- Eskerên Tirk tasek av bi 5-10 Dînarê Iraqî difrotin.

3- Kesên ku ji sînor derbas dibûn û diketin hêla Tirkiyê, mecbûr bûn ku pere, radyo, sîleh û hwd. bidana eskeran.

4- Kesên sextekar û "parêzgerên gundan" çewalek nan bi 4-5 keleşînkofan difrotin. Keleşînkofek bi 10 Dînara dihat firotin.

5- 8'ê Nîsana 1991'ê - Selmên Rûleh-12 salî( ji Zaxoyê) wexta çû erzaq ji alî eskerên Tirkiyê ve hat kuştin.

6- Herroj ji sermayê û ji birçîbûnê 10- 12 zarok dimrin.

7- Kesên li kampê ne ji % 80'ê wan nexweş in. ❑



*Eskerên Tirk tasek av bi 5-10 Dînara difrotin* — *Foto: Armanc*

# Li stenbolê barbariya Seddam hat protestokirin

***S. Deniz/ Stenbol***

Rejima diktator ya Seddam Huseyîn raperîna gelê Kurd li Kurdistana Iraqê bi zordarî pelçiqand; bi milyonan Kurd ji ber panîka bikaranîna çekên kîmyayî warên xwe terk kirin û berê xwe dan Tirkiyê û Îranê. Li ser vê trajediya gelê Kurd li her derê cîhanê tevgerên cûr be cûr hatin çêkirin.

Li Stenbolê jî hêzên welatparêz yên Kurdistana Başûr (*Partiya Pêşeng, Platforma Ala Rizgarî, Rizgarî û Têkoşîna Sosyalîst*) Platforma Hêzên Welatparêz ên Kurdistanê çêkirin.

Vê Platformê bi aktîvîtên cur be cur katlîama Seddam protesto kir. Bi vê munasebetê Platformê, di 12'ê Nîsanê de li meydana Beyazidê meşek korsan- nêzî 150 kesî beşdar bûbû- çêkir. Platformê bi welatparêz û rewşenbîrên Kurd re alîkariya maddî berev kir.

Platformê ji raya giştî re belavokek jî belav kir. Di bela-vokê de dûr û dirêj li ser wahşeta rejima Seddam disekinin û dibêjin; " ji bo me çareserkirina herî rast çareserkirina pirsa siyasî ya gelê Kurd e."

**Şeva piştgiriyê**

Ji bo piştgiriya Kurdên Iraqê; Komela Mafê Mirovayî ya Stenbolê şevek li dar xist. Şev di 12'ê Gulanê de li meydana tiyatroya vekirî çêbû û nêzî 8 hezar kesî temaşe kir. Di şevê de **Edip Akbayram, Aytaç Arman, Nur Surer, Ekrem Ataer, Ferhat Tunç, Mehdî Zana** û komikên muzikên Kurdan wek; **Koma Dengê Azadî, Koma Serîhildan û Kulîlikên Medya** hazir bûn. Di nav mêvanan de Dr. Ismaîl Beşikçî jî hebû. Şev, gelek bi şahî derbas bû. Di van salên dawî de li Stenbolê şewek wiha nehatibû amede kirin.

# Dinyayê Seddam ricimand Arafêt ew pîroz kir

**❑ Li gor delîlên ku di destên hêzên Kurdan de ne, çekdarên Filistîniyan bi eskerên Seddam re li dijî Kurdan şer kirine**



Bi kiriza Kuwêtê re ne tenê nav û dengê Seddam belav bû, bi qasî wî siyaseta Yasar Arafat û Rêxistina Rizgariya Filistîn (RRF) jî bû mijara munaqeşe û rexneyên siyasî. Gelek hêzên demokrat û pêşverû ji ber piştgiriya RRF'ê bo Seddam Husên, Arafat rexne kirin. Kes û hêzên rexnegir digotin:

-Tevgera ku ji bo rizgariya miletê xwe li dijî îşxalê şer bike, çawa dikare bibe heval û pişt-gira îşxala welatekî din?

Lê li alî din, gelek kesî wisa bawer dikir ku piştî Seddam teslîm bû û ji Filistîniyan re bêyî zirarê û navekî xerab tu qezenceke siyasî bi dest nexist, wê Arafat jî êdî li xwe varqile û siyaseta xwe ya beranberî Seddam ji nuh ve ji ber çavan derbas ke. Lê belê çawa ku Arafat bi cîgirtina xwe ya di cepha Seddam de dinya şaş hîşt, her wiha nuha jî bi domandina vê piştgiriyê û parastina qetlîamên Seddam ên li Kurdistanê û li başûrê Iraqê careke din dinyayê şaş dihêle.

Bi êrîşa Iraqiyan a ser Kurdistanê re hin agahdarî hatin ku cî cî çekdarên Filistîniyan jî di nav ordiya Seddam de li hember Kurdan şer dikin.

Hin hêzên Kurd ev şêla Rê-xistina Rizgariya Filistîniyan ya li hember tevgera gelê Kurd bi nivîskî protesto kirin. Ji van protestoyan yek, bi awayê nameyekê û bi îmza "Hêzên hevgirtî û rêxistinên Kurd li Swêdê û Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêdê" ji RRF liqê Swêd re hat şandin. Ew di nameya xwe de dibêjin:

-Nûçeyên Kurdistana Iraqê me ditirsînin û diêşînin. Ji me re nûçe hatine ku gelek şerbazên ji rêxistinên Filistîniyan têkilî şer bûne, li dijî Kurdan radiwestin û di şerê nemana Kurdan de beşdar dibin.

-Em biraderên Filistîniyan ji van tiştan agahdar dikin û ji wan dixwazin ku bi awakî pirr bi lez hêzên xwe ji wir bikşînin û piştgiriya xwe ji bo gelê Kurd nîşan bidin.

Rexneyek din jî ji alî Komela Xendevanên Kurdistanê li Ewrûpa (KSSE) ve bi navê "Nameyek vekirî ji Arafat re" hat kirin. KSSE di nama xwe de dibêje:

-Delîl ketine destê me ku çekdarên we mil bi milê eskerê Seddam re beşdarî qetlîamên Kurdistanê û başûrê Iraqê bûne.

Li alî din, piştî ku Seddam li başûrê Iraqê û li Kurdistanê serîhildanên gel bi hawakî pirr hov û bi xwîn şikand û rejîma xwe ji xistinê xelas kir, Yasar Arafat jî ji ber vê serkeftina Seddam, ew pîroz kir. KSSE, di nama xwe de vê şêla Arafat jî protesto dike û di dawiyê de jî çend pirşan jê dipirse.

-Em beyana Arafat bi dijwarî protesto dikin. Ku ew di vê beyana xwe de Seddam pîroz dike, ji ber ku ew di şerê navxweyî de bi ser ketiye. Em ji Y. Arafat dipirsin, gelo ew serketin bû ya qetlîam? (..) Me bawerî bi danûstendinê heye. Ji bo wê jî em dixwazin hûn bersîvên van pirsan bidin:

1- Hûn bawer dikin ku piştgiriya we ya bi Seddamê faşîst re qezenceke bigihîne doza we?

2- Hûn bawer dikin, rejîmeke ku miletekî bipelçiqîne, bi karibe miletekî din rizgar bike?

3- Ma merivekî têkoşer û azadîxwaz dikare çavên xwe li kirinên Seddam bigre?

4- Ma dibe meriv edaletê, demokrasiyê û mafên mirovan, ji hev veqetîne, yan ji hinekan re bixwaze û ji hinekan re nexwaze?

**Z. Xamo**

www.arsivakurd.org

## ê re

# Kurdistana Iraqê erêma Kurdistanê

nufûsê di çarçewa herêmê de bi emrê EGH yan wekîlê wî bêyî ku benda b) ya vê maddê bê jibîrkirin tên neqilkirin .

d) Karmendên teşkîlatên ku di benda a) ya vê maddê de hatine, li gor qaîde û selahiyatên û taybet bi wan ve di Cumhuriyeta Iraqê de beyî ku naveroka benda b) ya vê maddê bê jibîrkirin tên tayînkirin û neqilkirin.

e) Emnê hundurîn a herêmê û dezgehên berpirsiya karûbarên hundurîn bi EGH ve girêdayî ne.

**Madda Panzdan:** a) Daîrên desthelata merkezî yên li Herêmê, dikevin bin desthilata wezaretên xwe yên ku ew pê ve girêdayî ne û karûbarên xwe li gor xusûsiyetên xwe pêk tînin. Mafê desthilatên herêmî heye ku çavdêrî û kontrola giştî li ser wan bikin û rapora li ser wan bidin wezaretên ku ew pê ve girêdayî ne û divê ji bo berpirsyariyên xwe bi cîh bînin alîkariya wan bikin.

b) Li gor îxtîsasên xwe, mafê desthilata merkezî heye ku raya giştî bide her îdarên herêmî ku di madda yazdan a vê qanûnê de hatine binavkirin.

c) Mafê Serokkomar û Serokwezîr heye ku wezîran bişînin civînên OBH.

d) Desthilata Merkezî tê agahdarkirin bi biryarên dezgehên otonomiyê û qanûnên wê di riya serokê MTH re li gor her warekî.

e) Serokê OB endamê Meclîsa Wezîran û yê Meclîsa Plankirinê ye.

**Madda Şanzdan:** Mahkemek Destûrî ya Bilind çavdêriya meşrûîyeta qanûn û biryarên dezgehên otonomiyê dike ku ji bo qanûn û biryar ji desthilata merkezî muxalifî selahiyet û tifaqa otonomiyê li gor destûr û qanûnên wan dernekevin. Ev mahkeme ji neh endamên pisporên qanûnê pêk tê; çar ji wan xelkê herêmê ne, ew û serok bi lihevkirina serokê parlamentoya merkezî û yê MTH tên hilbijartin. Muddetê dewra mehkema destûrî du sal in û dibe ev dewre carek din jî bê dirêjkirin . Biryarên wê bi piraniya endaman tên girtin.

Yan jî mahkeme ji serokê Mahkema Temyîzê û du endamên wê û serok û alîkarê serokê îstîn'afa herêmî û çar karmendên kadroya dereca yekê; ku desthilata merkezî duduyan ji wan hildibijêre û herduyên dîtir heyetên herêmî hildibjêrin pêk tê. Yan jî ji çend endaman pêk tê ku nîvê wan MTH tayîn dike.

b) Wezîrê Adaletê dikare îtîrazê li biryarên dezgehên Otonomiyê li cem Mahkema Destûrî ya Bilind bike ya ku di benda berê de hatiye binavkirin, eger li dijî destûrê yan jî qanûnan bin, ew jî di nav 30 rojî de ji tarîxa ku desthilata merkezî pê agahdar bûye û Emîndarê Adaletê îtîraz li guhertinên destûrê, qanûn, biryarên ku ji alî desthilata merkezî derdikevin li cem mehkema Destûrî ya Bilind bike ji alî muxalifî xusûsiyat û selahiyatên otonomiyê li gor destûr û qanûnên ku têkilî pê ve ne, di nav 30 rojan de ji tarîxa ku dezgehên herêmî pê agahdar bûne.

c) Li qanûn û biryarên dezgehên otonomiyê îtîraz dike, guhertinên destûrî, qanûn û biryarên desthilata merkezî li cem mehkema Destûrî ya Bilind îtîraz dike û bicîhanîna wan tê rawestandin heta biryara zelalkirina wan.

d) Mahkema Destûrî ya Bilind herî pirr di 30 rojan de hukmê xwe li ser îtîrazê dide.

e) Guhertinên destûrî, qanûn û biryarên merkezî, qanûn û biryarên herêmî ên ku Mahkema Destûrî ya Bilind meşrû nabîne, hemû bi hev re yan jî beşek ji wan laxû dibin ji tarîxa ku hatine derxistin. Û hemû eserên wan ên qanûnî jî tên hilanîn.

f) MDB biryarên xwe agahdarî wezîrê Adaletê û Emîndarê Giştî yê Adaletê dike û di Rojnama Resmî de jî dide weşandin.

**Madda Huvdan**: a) MTH gava nikaribe selahiyatên xwe ji ber îstifakirina endamê xwe, pêk bîne, yan jî nîsbeta wê ya qanûnî di nav 30 rojan de ji tarîxa banga civînê temam nebe, yan jî ji ber bêtir ji sê caran bawerîpêneanîna endamên OB ku di benda d) a madda 10. a vê qanûnê de derbas dibe, yan eger xwe nede ber biryarên MDB a ku di madda 16 a vê qanûnê de hatiye, mafê serokomar heye ku wê fesh bike.

b) Eger MTH fesih bû, OB selahiyatên xwe dimeşîne heta MTH ya nuh tê hilbijartin yan jî di nav 60 rojan de ji tarîxa derketina fermana cumhurî ya fesihkirina wê tê hilbijartin.

c) Çi benda destûr û qanûnê hebe ku li dijî vê projê ye tê lexûkirin.

**Mulaheze:** Divê guhertinên destûrî yên pêwist pêkbên ji bo bicîhkirina pêkanîna otonomiyê û ji bo maddên esasî yên projê têkevin destûrê.

**-paşko-**

**Yekîtiya Nîştimanî:**

Herêma Kurdistanê, di van sê dehsalên derbasbûyî de, ket ber hoyên gelek aloz û dijwar ku herkes pê dizane. Ev yek bû sedem ku welat têkeve ber xeteran û gelek potansiyelên mezin bên sekinandin, ruhê berpirsyariyê li cem beşekî mezin ji hemwelatiyan zeîf kir, welê kir ku rewşên îstîsnaî di ser ên tabîî re bên wergirtin. Hemwelatî ji alî desthilatê ve ketibûn ber şik û gumana. Vê yekê tesîrek negatîf li ser yekîtiya nîştimanî kir.

Xurtkirina yekîtiya nîştimanî armanca herkesî ya bilind e û windabûna wê rê li ber pêşveçûna millet û welêt digre û tu alî ji zerara wê nayên parastin. Loma jî divê ew li ser esasên jêrîn,zû û bi bingehîn bê çareserkirin:

1) Yekîtiya nîştimanî, bi hilanîna hoyên ku li ber geşbûn û xurtkirina biratiya Kurd û Ereb hene, tê xurtkirin.

2) Xurtkirina Yekîtiya nîştimanî di riya hilanîna tadeyiya dîrokî ku gihaştiye miletê Kurd pêk tê û bi bicîhkirina mafên rewa û belavkirina edaletê, temînkirina, wekhevîyê û wekheviya firsetdayînê ji bo hemû eqaliyetên milî.

3) Biserketina qanûn û nîzamê lazim e. Divê her kes vê yekê qebûl bike. Ev jî di riya zor û şiddetê re pêk nayê.

4) Divê serokatiya tevgera Kurd (C.K.) heta jê tê alîkariya hukumetê bike ji bo parastina sînor û emniyeta Iraqê li herêma Kurdistanê

5) Serokatiya tevgera Kurd (C.K.) divê bi xurtî alîkarî bike ji bo rêlibergirtina awayên çekdarî yên neqanûnî li herêma Kurdistanê û ji bo parastin û xurtkirina yekîtiya niştimanî ya Iraqê.

**Normalîzekirina rewşa li Kurdistanê:**

**Hilanîna zerf û mercên îstîsnaî**

1) Hemû mahkûm, tewqîf, firar, girtî û penaberbûyî yên ji ber sebebên siyasî û yên ku gîhaştine hêza pêşmerge; çi Kurd û çi xeyrî wan ji sivîl û eskeran, çi zabit û çi leşker (hemû endamên quwetên çekdar ji ordiyê û polîs û hêzên Emniyeta Hundurîn û çekdarên parastina nîştimanî û mufrezên taybetî) divê bi giştî bên efûkirin. Cezayên eslî û yên ji wan derketî û netîcên wan ên sivîliyê divê têkevin ber vê efûyê. Hecza li ser malê wan ê menqûl û xeyrî menqûl tê hilanîn û biryarên di heqê wan de derketibûn lexû bibin û tazmînatên adil (haqkirî) bigihên yên ku zirar dîtine û hemû mafên wan li wan vegerin, mehkûm, mewqûf û girtiyên ku dikevin ber vê efûyê bên berdan û efûyek giştî ji bo hemû mehkûm û girtiyên Iraqî yên siyasî derkeve bi munasebeta vê îttîfaqê. Ew qezancek e ku alîkariya xurtkirina yekîtiya nîştimanî û vê tifaqê xurt dike.

2) Karmend mustaxdem, karker û endamên quvvetên çekdar, zabit û yên bê rutbe ji leşker û polîsan û hêzên emniyeta hundurîn û Kurdên nobedarên hudûd û xeyrên wan ên qewirandî ên ku xizmeta wan hatiye lexûkirin û dûr bûne û yên ku hatine teqawudkirin ji ber sedemên siyasî, divê vegerin ser karên xwe, bêyî girêdana bi jimara kadroyen ve û dewra dûrbûn, derkirin, teqawudbûn û ezla wan bê hesabkirin wek dewrek aktîfî ji bo meselên zêdebûna meaş û terfîkirin û teqawudiyê.

3) Karmend û mustexdem û karkirên ku ji daîre yan îxtisasên xwe yên eslî neqlî daîre û îxtisasên dîtir bûne, yan ji mintiqa Kurdistanê hatine şandin ji bo wîlayetên din, ji ber sebebên siyasî, Kurdên li her çar aliyê Iraqê divê vegerin daîre û ser karên xwe yên berê.

4) Xwendevanên qewirandî, mehkûm, girtî û bazdayî û penabûyî yên siyasî yan yên ku gîhaştine hêzên pêşmerge divê vegerin dibistan û fakulte û esntîtûyên xwe û alîkariya bursên xwendinê ji yên muhtac re bên dayîn da ku xwendina xwe xelas bikin û salên dûrkirina wan ên ku wenda bûbûn neyên hesibandin û xwendevanên Kurd ên li derveyî Iraqê karibin têkevin dereca salên xwe û unîversîte û enstîtuyên xwe, bi şertê ku hemû mafên wan bi temamî bên temînkirin.

5) Xwendina Kurdan û eqaliyatên dîtir di dibistan û enstîtû û dezgehên hîndekariyê, ûnîversîtan, xwendina bilind ên sivîl û eskerî de, her wiha di bursên ilmî û bursên din de û di îznên xwendinê û burs li hundur û derva bê îstisna yan ferqîtiyê û li gor kîfayeta wan bên qebûlkirin.

6)Unîwersîta Silêmaniyê divê vebe.

7) Xelkên penaberbûyî yên gundan, qeza, belediye û wilayetan divê vegerin gund û warên xwe û zerara wan bê tazmînkirin û cî û warên wan bên avakirin û pêşdexistin, bi wî awayî ku her awe xizmet bê gîhandin ji bo wan da ku li gor îmkan û bikêrhatinên xwe yên tebîî, ziraî bibin navçên pêşketî di warê ziraî, heywan xwedîkirinê, sinaîya biçûk, turîzmê da ku li gel pêşvebirina ekonomiya welêt, ewleyî û parastina welêt xurt bibe.

8- Divê hemwelatiyên Ereb ên ku hatine li warên Kurdî yên xwe yên ne eslî bicîh bûne, bên vegerandin cî û warên xwe yên eslî yên berê.

9- Divê Barzanî û ew qurbanên êrîşa enfalê bên vegerandin û li ciyên xwe yên eslî bên bicîhkirin.

10- Ew Kurdên Feylî ên ku hatine mecbûrkirin cî û warên xwe terk bikin û koçî cihekî din yan derveyî welêt bikin, divê destûra wan bê dayîn ku vegerin welêt, yan li ciyên xwe yên eslî yan jî li herêma Kurdistanê bi cîh bibin, milkê wan li wan bê vegerandin, zerar û ziyana wan bi adilî bê tezmînkirin û hemwelatîtiya Iraqê ji bo wan bê dayîn.

11) Qanûna reforma ziraî divê di herêma Kurdewariyê de bê bicîhkirin û bi awayekî ku li gor menfeeta cotkaran be bê guhertin û pêwendiyên feodalî nîhaîyên tesfiye bike. Divê hemû cotkar bibin xwedî parçekî erdê munasib û bac û deynên erdan ên ku di demên kevin de li ser wan kom bûne, bên efûkirin.

12) Lexûkirina qanûnên rewşa îstîsnaî bi awakî wiha ku erdên herêma otonomiyê kiribûn erdên emîrî (dewletê) li xwediyên wan ên eslî bên vegerandin û hemû qanûn, qerar û talîmatên îstîsnaî bên lexûkirin.

13) Ji nuh ve avakirina Akademiya Zanistî ya Kurdî ku serbestiya xwe îdarekirina wê ya taybetî hebe û hewl bê dan ku li gor qanûna Akademiya Zanistî ya Kurdî ya reqema 183 a sala 1970'yî bê neqilkirin ji bo merkeza otonomiyê.

14) Divê meaşê teqawudiyê bê texsîskirin ji bo aîlên ku endamên wan şehîdbûne, yan îdambûne di demên îstîsnaî yên kevn de û ji yên din ên wekî wan û ji bo seqetan bi sebebê wan rewşan, xaniyên munasîb ji bo wan bên texsîskirin, qanûnek taybetî (biryarnamek) ji bo van karan divê derkeve, divê ew têkevin çarçewa lazimiyên ku ji bo şehîdên welêt tên dayîn.

15) Divê ambargoya îktîsadî ji ser Kurdistanê bê hilanîn û maddên serfê ji bo jiyanê bi hemû curên xwe ve li herêmê bên peydakirin, kontrol li ser bazara reş û spekulantiyê bê şidandin.

16) Hemû xizmetên karên avayiyê û pêşvebirinê divê vegerin Kurdistanê; projên turîzmê û havîngehan, avdanî, bandav û çandinî, elektrîk, îndustrî, kanal û avê, riyan, pir, avakirina dibistanan, ya nexweşxane û klînîkan, xaniyan û hemû projên cur bi cur ên ku hatine sekinandin, betalkirin û projên nû jî tê de. Çêkirina planekê ji bo pêşvebirina navçê, tazmînkirina ew pêşketina ku gîhaye wê, li gor siyasetên butça salane yan planên avakirina milî û texsîskirina çavkaniyên pêwist ji bo wan.

17) Li gor Beyana 11'ê Adara 1970'yî, planek zûtirîn wext bê danîn ji bo pêşketina Herêmê û telafîkirina paşdeketina wê

18) Divê bi darê zorê hevwelatiyên Kurd neyên mecbûrkirin ku bibin endamên partiyên siyasî û rêxistinên cemahîrî. Bicîhkirina maf û erkan û bidestxistina îmtîyazan û peydakirina berjewendiyan neyê girêdan bi wê endametiyê. Qanûn û nîzamên ku li dijî vê maddê re divê bên lexwkirin.

**Demokrasî li Iraqê**

Ew problemên aloz ên ku li pêşiya miletê Iraqê ne; bi Ereb, Kurd û eqeliyetên xwe yên milî û dînî ve peyda nedibûn, nediketin serhev û nediazirîn eger demokrasiyek ta dereceyeke munasib hebûna, eger rê li ber hêzên siyasî yên nîştimanî yên cur bi cur vekiribûna ji bo ku karîbûna bîr û baweriyên xwe li ser çareserkirina wan probleman û hê di destpêkê de rê libergirtina wan bibêjin. Garantiya serekî û esasî û xurt ji bo çareserkirina problemên milet û welatê me û pirsa miletê Kurd jî tê de li gor heyeta Cepha Kurdistanê, di peydakirina atmosferan ku milet û hêzên wî yên siyasî yên cur bi cur bi hemû baskên xwe yên fikrî û siyasî serbestiya xwe ya siyasî li ser bingehê avakirina dewleta huqûqî û garantî û îhtirama mafên mirovayî û pirpartîtî û serbestiya helbijartina nûnerên milet di Meclîsa Watanî de û serbestiya azadî çapemenî û weşanî, ya rêxistinên sendîkayî, meslekî û demokratîk û cìghertina di desthilatê de bi aşîtî û li gor daxwaza milet azadî de ye.

Ji bo bicîhkirina demokrasiyê li Iraqê û otonomiyê li Kurdistanê divê hukumetek koalîsyonê ya muweqet bê avakirin da ku ew karibe şertên pêwist ên hilbijartinek serbest piştî şeş mehan ji roja danîna wê hukumetê pê ve amade bike. Di vê hukumetê de Cepha Kurdistanê jî tê de divê hemû hêzên nîştimanî yên mixalif beşdar bibin. Ji vê hilbijartinê meclîsek watanî ya tesîsî derdikeve ku destûrek daîmî ji welêt re deyne û hukumet piraniyê wê jê derkeve.

Projên ku heyeta Cepha Kurdistanî ji bo normalîzekirina rewşa welat û Kurdistanê pêşkêş kirin, programekî acil e û di halê pêkanîna wê de, em zemînek saxlem ji bo çêkirina hilbijartinan ku welêt dixe emniyet û îstîqrarê û ji bo hemû huner û hêza bên bikaranîn ji bo çareserkirina problemên welêt ên aloz û dijwar peyda dike.

❏

## Çîrok

# Xortanî û kaltî

**Îvan Bûnîn**
**Ji Rûsî wergêr: Tosinê Reşît**

Rojên havînê yên xweş, Derya Reş a nivistî.

Keştî bi mirov û hebûnê va tijî ye -textê jorê ji pozê wê heta derdana bi ardû barkirî ye. Rê dûr e, çivane ye- Qirim, Qavqaz, rûbarê Anatolîyê, Konstantînopol...

Tav diqijilîne, esman hêşîn e, derya sût e. Hêwirgê li pey hev li îskelê pirmerî, bi reqe -teqa zincîr û heçiya, ku guhê mirova ker dikin, bi çêr, bi qîrîna alîkirê kapîtana- û dîsa hêsabûn, qeyda-qanûn û di riya hemdê xwe ya rex dûraya çiya ra, ku di nava xumama tavê da sincirî dibişkivîn.

Di kayût-kampanyê dereca yekê da hênikayiya avê ye, vala ye, fire ye, paqij e. Li bal destê rêwiyê ser textê jorê, li ewê kêleka motora germ û aşpêjxana ku bîn jê tê, li ser textê bin heywanê, li ser zincîrên yakor û ser şirîtên derdanan ardû cîbûbûne, qilêr e û teng e. Li vira, ji her aliyî bîna six tê, hey bi kel û xweş, hey bi germ û pîs. Lê ew bîn, ku tevî hênikayiya deryayê dibe, tim bi tehereki cihê, bi teherê deryayê ye. Li wê derê mûjîkên Ûris in tevî jinan, xaxol in û jinên wan, keşîşê tekya Afonê, Kurd in, Gurc in, Hurum in...

Kurd gelekî bi temamî cihê ne, ji sibê heta êvarê radizên, Gurc hey distirên, hey cot-cot direqisin, çapik-çapik banzdidin, bi sivkayîke xweşik devzendikên xwe yên dirêj paşda davêjin û bi teqla dest li hevxistinê ya taş-taş, di nav xelqê tîşbûyî ra dişûlikin.

Heçiyê Ûris e, ku diçine Felestînê, ji sibê heta êvarê çayê vedixwin. Mêrekî bejnbilind e bi girmilkê dardabûyî, bi rîdana zere zirav û porê rast, kitêbê bilind dixwîne, jineke kubara serbest, ku kurtikê sor li xwe kiriye, êratîke kesk a pir-pirki bi porê xwe yê reşe ziha ve girêdaye, li rex aşpêjxanê tenê sekiniye û zûr bûye li wî mêrikî dinihêre.

* * *

Li Trabîzonê keştî pirr rawestiya. Ez peya bûm û dema vedigeriyam min dîna xwe dayê wa ye di textê pêpelînga ra cerdeke Kurdê çekdar ê kincê gincir lê, hildikişe; komek xulam-xizmetkarên Kalo hebûn, ku ew pêşiyê diçû. Kalo bi bejn û navmil fire bû papaxekî ji postê berxa li sêrî bû, kirasekî sipî û çerkezîkî gewr lê, ku li ser navkêlka xwe ya zirav bi kembera zîvkildayî şidandibû. Kurdên tevî me di keştiyê da, ku li bal hev alîkî text ve zekiya bûn, gişk rabûne ser xwe û ciyê aza vekirin. Xulam-xizmetkarên Kalo gelek xalîçe raxistin û balgî dane ser. Kalo nolî padîşah li ser wî textî rûnişt. Rîdana kalo mîna berfê qerqaş bû, rûyê wî li ber tavê qimilî bû, çavên reş ên hûr bi şewqeke nebînayî diçûrisîn.

Ez nêzîkî wî bûm bi qerefîska li kêlekê rûniştim, min "selam" dayê û bi Ûrisî jê pirsî:

- Ji Qavqazê?

Ewî bi dostanî bersiva min dîsa bi Ûrisî da.

-Wêdatir, maqûl. Em Kurd in.

- Lê a wiha bi ku da?

Ewî bersiva min hêdî, lê bi serbilindî da:

-Diçime Stenbolê, maqûl. Diçime ba padîşê bi xwe. Seva padîşê bi xwe spasiyên xwe dibim hevt qamçiyan. Padîşê hevt kurê min birine şer, gişk, çiqas hebûn, her hevt jî di şer da hatin kuştin. Padîşê ez hevt caran navdar kirim.

-Ti, ti, ti- got bi heyfanîna bêfesal Hurumê Kêrçêyî xortê pozbilind, ewê ku di ser me ra sekinîbû. Cigara di dêst da, fêsê Şamê yê rengê gevez, sirtûkê gewr tevî êlekê sipî, şalwarê nûjenî gewr û pêlavê biriqandî ku di kêlekê ra dihatine pevxistinê û barbûna wî didane kivşê, -Usa kal û tenê maye.

Kalo li fêsê wî nihêrî.

-Çi nezanî,- ewî hema usa got,- A tuyê bibî kal, ez kal nînim û tu cara kal nabim. Tu mesela meymûnê zanî?

-Kîjan meymûnê?

-Usan e bibhê. Xwedê erd û esman hinartin. Zanî?

-Em bêjin zanim.

-Paşê Xwedê mirov hinart û gotê: "Mirov, tu yê sî salî li dinya ronik bijîyî, tu yê baş bijîyî, tu yê şa bî, tu yê bifikirî, wekî Xwedê li dinya ronik her tişt tenê seva te hinartiye û çêkiriye. Tu qayîl î? Lê merî fikirî: usa xweş û tenê sî sal! E, kêmel dibhêyî? Kalo bi qerf pirsî.

-Dibhêm,- xort bersiv da.

-Paşê Xwedê ker hinart û gote kerê: tu yê iyara û bara pişt kî, mirov wê li te siyarbin û bi şiva li serê te xin. Tu ewqas sala dixwazî? Û ker ziriya, zariya, gote Xwedê: çî ji min ra ne ewqas? Ya Xwedê tek panzdeh sala jînê bide min. -Panzda bi ser jîna min da zêde ke, -mirov gote Xwedê,- bi kerema xwe ji para kerê zêde ke!- Û xwedê qayîl bû, usa jî kir.

Û jîyana mirov derket çil û pênc salan. Bona mirov baş bû ne? -Kalo li xort nihêrî û jê pirsî.

Ne xirab e, -ewî bi dudilî got. Çawa tê xuyayê tê negihîşt ku gilî derheqa çi da ye.

-Paşê Xwedê kûçik hinart û sî sal jîyan da wî jî. Tu yê tim bi hêrs bijîyî, -Xwedê gote kûçikê,- tuyê miqateyî hebûna xweyê xwe bî, tuyê bawariyê bi tu kesê xerîb neynî, tuyê biewtî rêwiya, tu yê qet bi şeva jî netevitî, ranezêyî. Û zanî zûkîn bi kûçikê ket: na, nîvê wî jî besî min e! Û dîsa mirov lavayi ji Xwedê kir: ewî nîvî jî bi ser jîna min da zêde ke! Û Xwedê ew jî bi ser jîyana wî da zêde kir.- Niha bû çend salê mirov?

- Bû şêst,- Xortê xweşik bi şabûn got.

- De, paşê jî Xwedê meymûn hinart, sî sal jîyan jî da wê û gotê:, wekî ewê bê kar û xem bijî, tenê rûçikê wê yê gelekî eblû be,- zanî, keçel, bi qerçimok, buriyên tazî li ser eniyê ku gişk bixwazin lê binhêrin û gişk ê pê bikenin.

Xortê xweşik pirsî:

Usan e ew jî qayîl nebû, tenê nîvê wan salan ji xwe ra xwest?

-Ew jî qayîl nebû,- kalo got, hevkî ji ciyê xwe bilind bû û ji destê Kurdê nêzîk miştka qalûnê hilda,- Û mirov ew nîvî ji ji xwe ra xwest,- ewî got dîsa vezekiya û xwe rakişand.

Ewî kerr-lalcîkî li pêşya xwe dinihêrî, tê bêjî qey em ji bîrkiribûn. Paşê dîsa peyivî, lê bi xwe ra.

-Mirov sî salê xwe yên rast bi mirovayî derbaz kirin-xwar, vexwar, şer kir, di şayiyan da reqisi, ji keç û jinên tercan hiz kirin. Panzdeh salê kerê kar kir, mal-dewlet civand. Panzdeh salên kûçkê hebûna xwe parast, ewtiya û bi hêrs ket, bi şeva raneza. Paşê jî kal û eblû bû mîna wê meymûnê.

Û gişk bi kalîtiya wî dikeniya û serê xwe dihejandin. Ay, eva gişkê wê bê serê te jî,- Kalo bi qerf gote xortê xweşik û miştika qalûnê di nav diranên xwe da zivirand.

- Lê çira ew gişk nehatiye serê te?- xort jê pirsî.

-Nehatiye serê min.

- Lê ew çawa bûye?

- Yê mîna min hindik in,- kalo bi giranî got,- ez ker nebûme, kûçik nebûme, ezê çira bibim meymûn? Seva çi ezê bibime kal. ❑

## Kurko malxirabo!

**Zînê**

Heta nuha hatiye zanîn ku jina Kurd sê rengên bindestiyê dibîne. Yek, bindestiya aborî; dudu, bindestiya netewî; sisê, bindestiya civakî. Van bindestiyên hanê bindestiyeke dinê jî çêkiriye: jina Kurd bindesta bindestê bindesta ye. Di warê psîkolojî de nexweş e. Êdî bindestî di psîkolojiya jinê de bûye parçek ji laşê wê, ew nema dikare bê wê bijî. Ev reng bindestî ji serê sedsalan ve ye hatiye çandin. Îcar, bi rengekî geriyaye ku êdî ew ji jinan re bûye adeteke pîroz. Û li aliyê dinê jî, ew bi dilê mêran e.

Di vir de, gotineke hêja ya Apo Osman Sebrî tê bîra min: "Mesela mêrê Kurd û peyatiyê bûye mesela kurk. Yanî mêrê Kurd peyatî li xwe wek kurkekî xweş dîtiye; dema wî kurkî ji pişta xwe bavêje sebra wî nayê, ewê pê bihese ku tiştekî wî î kêm e!"

Vêca, mesela jina Kurd û bindestiyê jî bûye mesela mêrê Kurd û peyatiyê. Lê hema hinekî ji hev cuda ne. Mêrê Kurd kurkê xwe bi destên xwe çê kiriye, jina Kurd kurkê wê bi destên pir kesan hatiye dirûtin: Olperest, kevneperest, dê û bavanê paşketî, bira, mêr, heval û rewşenbîrên xwedî kiras, kedxwar, keysparêz... Germiyana wî kurkî li heza jinê jî hatiye! Her tim tirsa wê û kesên bi wê ve girêdayî ew bûye ku ba li wî kurkî xîne û serma bidê!

Çawa mesela jinê bûye nexweşiyeka psîkolojî? Berî ku hîn keçik çavên xwe li dunya ronik veke, çandina vê nexweşiyê dest pê dike. Em nimûnena ji mêjiyê vê civaka patrîyarkal nîşan bidin: Îro em di sedsala bîstan de ne û li Ewrûpayê dijîn, mêrê Kurd ji jina xwe ya Ewrûpî re dibêje: "Ez hêvîdar im ku cêwiyê zikê te herdu kurrik bin! Çimkî jiyana keçikê li Ewrûpa serêşî pê ve heye".

Ev li Ewrûpa, ma gelo li welêt çawa ye? Heya roja îro li ba piraniya mêran, zana û nezanan, rewşenbîr û xwendan, bûna keçikê weke hatina mêvanê piştî nîvê şevê ye, yanî ne bi dilê xudanê malê ye! Kurrik dibe, çavên wî li rûyên geş û lêvên bi ken dikevin, pêçeka wî bi dilşadî û bi ramûsanên germ li ser destan tê gerandin. Û bi lîlelîl tê belavkirin ku kurrekî filan malê çê bû! Keçik dibe, gava çavên xwe vedike, ew rûyên çelmisî û lêvên qermiçî dibîne, bi ramûsaneka sar pêçeka wê radikin û li kêleka diya wê datînin. Jiyana kurrik bi qurban û heyran derbas dibe, a keçikê tisî! Di warê mezinkirinê de, cudayîyeke ji erd heya bi ezman di navbera herduyan de heye. Serketin û pêşdebirina kurrik û paşdehîştin, perşikandin û dilmelûlkirina keçikê armanca kesên li dorê ye. Bi gilyekî dinê, her tim dest li "pişta" kurrik û li ser "serê" keçikê ye. Ev reng mezinkirina hanê bi wan re mezin dibe, qelîşteka cudayiyê firehtir dibe. Yek jê: ger keçik xwedî şans derê û bi birayê xwe re here dibistanê, dema serê sibê dê û bav bi yek dengî dibêjine kurrik "oxir be ji te re". Lê ji keçikê re dibêjin: "keça min, bila haya te ji te hebe, tu nav û nûçikan (xeberên nexweş ku li ser mirov tên belavkirin) bi ser me nexînî! Kurdên me dibêjin: "zerik ket, neşkiya, hema deng da".

Vêca dayik ban dike: "dengê min tê te? Şîret ne gerekê te ye ha! Weleh ger tu nav û deng bi ser me kevin, mebêje negotiye? Ezê goştê te bicûm ha!" Ev ton perwerdekirina hanê bi keçikê re diçe mala mêrê wê jî. Wisa bi mêrê wê re jî tê. Ji aliyê xwe de, keçik mêr dike, çi tiştê ku di wê de hatiye çandin, ew jî bi serê keça xwe de tîne! Em jinên Kurd pirsekê ji xwe bikin, Îro, helwesta me li hemberî van pêşketinên civakên miletên serdest, bi taybetî ya miletên Ewrûpî û yên dinê, wê çi be? Gelo em di bin kurkê li me dirûtî de negermixîne? Li xweşiya me tê, gelo heta kengî wê kurkê xelkê bi me xweş be? Heta ku ev kurkê xelkê li me be, tu carî kurkê me ji ser me nayê avêtin. Bi giliyekî dinê, heta mêrê Kurd ne serbest be, jina Kurd kok serbest nabe.

# Întibayên min ên li ser seyaheta Sovyetê -III-

*Hesen Mizgîn*

### Resamekî Kurd ê bi derd

Di roja 11.11.1990'î de me resamê Kurd Anton Mîrzoyev li "atolya" wî ziyaret kir. Min gotina atolyê xiste nav neynokê ji ber ku rebenê Anton tê de bê materyal û malzeme bû. Tenê 3-4 wêneyên wî li wê derê bûn. Min jî pirsî "kîjan wêne li ber dilê te a herî şîrîn e?" Wî bersîva min wiha da; "Wêneya herî bedew bi dilê min ya "Nanpêj" e. Wêneyên "Nanpêj" û "Şabaş" ji alî Muzeya Gurcîstanê hatine stendinê. "Siyabend û Xecê" jî bi dilê min xweşik in. Dema meta min ji min re çîroka "Siyabend û Xecê" digot, min hemî di xewnên xwe de didîtin. Ew ji xewnên min hatine.

Dema min resmê "Jina Lerceriskê (li Ermenîstanê gundek e)" ya tazî çêkir, xelkê xwest min bikuje. Resmê "Dengbêj" jî bi dilê min gelek xweş e. Resmê "xebatkêş" yek ji xebatên min ê xemgîniyê ye. Resim bi xwe xeta reş (karê giran wek hemalî û paqijî) tîne zimên. Îro li Gurcistanê gelê min karê reş dike. Resmê "Cihêz" ê şayiyê ye û adetên me ku min divê heya dawiya jiyana me bila bijî, tîne zimên. "Reqsa Payîzê" jî nîşana folklora me ye. Di demsala payîzê de dawetên me çêdibin".

Dema min ji Anton pirsa zehmetiyan kir, wiha got: "Ji bo min zehmetiya herî mezin peydakirina malzemeyên ressamiyê ye. Peyda nabin. Rewş roj bi roj xira dibe. Ez dixwazim tim û tim resim çêbikim. Ez dixwazim jiyana gelê xwe bikim resim. Ez hem kar dikim hem jî resim çêdikim. Alîkarî ji kesekî nastînim. Ji ber vê yekê jî di karê ressamîyê de pêşde naçim".

Min ji Anton pirsa daxwaziyên wî kirin. Wî got; "Daxwaziya min a herî mezin malzeme ye. Ji min re boyax bişînin. Li van deran boyax peyda nabin. Min divê werim Ewrûpayê û bi rismên xwe pêşangehekê çêbikim. Alîkariya min bikin. Min daxwaz ji Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê kir ku ji min re vîze bişîne, lê pir mixabin bersîv nedan".

### Tiyatroya Kurdî ya li Tiflîsê

Li Tiflîsê Tîyatroya Kurdî heye. Di 1979'an de hatiye avakirinê û di 1989'an de xwestiye 10 saliya xwe tevî şexsiyet; hunermend û komîkên folklorî yên Kurda pîroz bike. Lê pir mixabin ku rewşa siyasî rê nedaye. Me Tiyatroya Kurdî ziyaret kir. Niyet ew bû ku em piyeseke wan temaşe bikin. Lê ji ber hilbijartina parlamentoya Gurcîstanê destûr nedan Tiyatroya Kurdî ku piyesê bileyîzin. Me ji vîdeoyê piyesa "Cî-hangîr Axa" temaşe kir. Piyes li ser koçkirina Kurdan, dijîtiyên olî (dînî) yên di navbera Kurdan de û jiyana wan a di warên nû de ye. Bi rastî niha nikarim li ser naveroka piyesê dûr û dirêj qal bikim. Ku ez bêjim di dema temaşekirina piyesê de hêstir ji çavên me bariyan, dê bête fêmkirin ku piyes çiqas bi tesîr bû. Ji me re hat gotin ku Enstîtuya Parîsê wê van piyesan di kasetên vîdeoyê de zêde bike û bifroşe. Hêvî ew e ku rojekê zûtir vî karî bikin...

Li Tiflîsê di serokatiya Keremê Ankosî de seksiyona Fona Hîndekariya Kurdî ya UNESCO'yê hatiye avakirin. Armanca vê fona ha xurtkirina dostaniya gelan, bilindkirina seviya hîndekariyê, pêşdebirina çand, zanistî, medeniyet û sporê avakirina pirekê di navbera gelên YKSS û Merkeza Çandî ya Kurda de ye.

### Ber bi Alma-Ata'yê ve

Em di şeva 11.11.1990'ê de ji Tiflîsê çûn Alma-Atayê. Li ser rê, balafira me li payîtexta Ozbekîstanê, li Taşkentê danî. Spêde bû. Min ji rêberê me yê Rûs pirsa îmkana derketina der û gera li Taşkentê kir. Ji ber ku nêzî 3-4 saet diviyabû me li balafira Taşkentê bipaya, bersîva rêberê me; "Ma kes diwêre li Taşkentê bigere, her der bi pêxwas û serseriyan tije ye. Em nikarin li Taşkentê bigerin" bû.

Di 12.11.1990'ê de em bi selametî gihîştin Alma-Atayê. Li Alma-Atayê xuşka Helîme, xanima Nadirê Nadirov berê ku em bigihîjin Qazaxistanê ji bo me programêkiribû û derûdor ji hatina me agahdar kiribû. Ez dixwazim li vir spasî û minnetariya xwe pêşkêşî wê bikim. Kek Azîz Alîev Ziyevîç di heşt rojên li Alma-Atayê de em tu caran tenê nehiştin. Qedir û qîmeta ku Azîz şanî me da, ez tu caran ji bîr nakim.

### Piştî perestroykayê Merkeza Çandî û dersdayîna Kurdî

Kurdên li Qazaxistanê piştî perestroykayê li Alma-Atayê Merkeza Çandî ya Kurda ava kirine. Serokê vê avahiyê Ruslan e. Xuya bû ku Kurdên li Qazaxistanê hêj nû dest bi kar û barên xwe yên netewî kiribûn. Turkolog Kînyas Mîrzoyev di sohbetên me de behsa vekirina beşa Kurdî li Unîversîta Alma-Atayê dikir. Di ziyareta me ya Akademiya Zanistî ya Qazaxistanê de jî qala vî tiştî kirin. Akademî dixwaze beşek taybetî ji bo ziman û çanda Kurdî veke. Gotin ku ji nuha ve dest pê kirine, li Kurdologekî digerin da ku dest bi lêkolîna ziman û çanda Kurdî bike.

Di 14.11.1990'î de em çûn gundê Jana Tilbîsê. Xelkê vî gundî %75 Kurd e û şagirtên dibistanê ji nêzî %75 Kurd bûn. Wek min berê jî gotibû; dersdayîna bi zimanê zikmakî ya bi Kurdî piştî perestroykayê dest pê kiriye. Xuya bû herçiqas mamosta di mamostatiya xwe de xwedî tecrube bû jî di dersdayîna zimanê zikmakî de bê tecrube bû. Li vir dersa zimanê zikmakî di her sinifê de hebû û di heftê de 2 saet bû. Malzemeyên wan qet tunebûn. A herî baş ew bû ku mamosta xwediyê sinifekê bû, daxwaza zarokan hînbûna Kurdî hebû.

Kurdên li Qazaxistanê misilman in, lê xuya bû ku ne hewqas dîndar (olprest) bûn. Min pirsa rojiyê ji gundiyekî pirsî. Wî got ku ne rojî tê girtin ne jî nimêj tê kirin. Lê dema me bihîst ku Radyoya Dengê Amerîkayê gotiye ku wê li Alma-Atayê di navbera 17-20'ê Çiriya Paşîn de erd biheje, hin Kurdên xwenda yên li Alma-Atayê bi rehetî digotin; "Ew derewan dikin, ev yek îşê Xwedê ye. Ew nikarin di derheq erdhejandinê de tiştekî bêjin". Xuyabû ku Kurdên me herçiqas xwendabûn jî, haya wan ji pêşdeçûna teknîkê tunebû.

### Kurdên li Qazaxîstanê di vexwarinê de pir zîrek bûn

Kurdên li Qazaxistanê di xwarin û vexwarinê de pir zîrek bûn. Dema me dest bi xwarinê dikir, Kurdên me bi dorê radibûn, çend gotinên germ dikirin, di van gotinan de her tim qala Kurdistanê dihat kirin- û xêrhatina me dianîn zimên û qedehên xwe ji bo me radikirin. Îcar li gor adetên wan diviyabû em jî qedehên xwe rakin û bi derbekê (carekê) vexwin. Heya ku me qedehên xwe vala nekirina, ji piya li hêviya me diman. Piştî du-sê rojan tu hal bi nema bû, lê bê feyde bû. Herçiqas me lavayî dikir jî wan wek xwe dikirin. Di vî warî de Kek Ezîz pirr jêhatî bû û pêşî bi me dida vexwarin û pişt re jî wî bi xwe "vedixwar". Mirov ji sohbeta wan têr nedibû.

Li Alma-Atayê ji bil bazara bajêr -ku bazara prîvat bû- û firinan hemû dikanên din hema hema vala bûn. Tu tiştên bi kalîte li van dikanan tunebûn. Bi taybetî dikanên zîv û zêr vikî vala bûn. Li Tiflîsê jî wiha bû. Xuya bû yên ku perê hene yan jî yên ku xwedî meqam û selahiyet in li van dikanên zîv û zêr tu tişt nehiştibûn. Dihate gotin ku xelk ji tirsa kêmkirina qîmeta rubleyê, perê xwe ji destê xwe derdixin. Piyasa reş ji bo vê yekê îsbatek bû. Roj bi roj qîmeta rubleyê dadiket.

### Gundê Kurda 70 km. nêzî sînorê Çînê

Di 16.11.1990'î de em çûn gundê Akbastayî (Kaniya Spî). Ji %80'yê vî gundî Kurd bûn. Mudûrê dibistanê jî Kurd bû. Ji sînorê Çînê 70 km. dûr bû. Bi dahol û zirne hatin pêşiya me. Zarok kincên xwe yên Kurdî li xwe kiribûn û grûbeke wan a folklorê hebû. Mudir em birin oda xwe û ji me re qala hatina Kurda ya Qazaxîstanê kir. Mudir diyar kir ku Stalîn di wextê xwe de Kurdan ji cî û warên xwe -Navça Qerebaxê(!)- sirgûn kirine. Bi darê zorê û qefle qefle Kurd sirgûn kirine û her qeflek jî bi alîkî ve şandine, daku jihev dûr bikevin, danûstendina wan ji hev qut bibe û rojek zûtir asîmîle bibin. Li gor gotina mûdir, bi hezaran Kurd di riyan de ji ber birçîbûn û nexweşînên cuda cuda mirine. Kurd herçiqas qefle-qefle hatine şandin jî li hevûdu geriyane û hewl dane ku di ciyekî de kom bibin.

Li gundê Akbastayiyê ji bo her sinifê di heftê de 2 saet dersa zimanê zikmakî tê dayîn. Piraniya mamostan Kurd bûn. Di dema ziyareta me de mudirek ji gundekî din jî li dibistana Akbastayî bû. Bi xwe Kurd bû û li gundekî din kar dikir. Li gundê wî alman û miletên din dijiyan. Ji bo me fêrbûna zimanê Almanî pirr girîng e. Ji ber wê yekê jî me pirsa daxwaziya miletê Qazax, Kurd û hwd. a fêrbûna zimanê Almanî ji mudir kir. Mudir bi awakî matmayî li me nihêrt û got; "Ma emê çima Almanî fêr bibin? Na, tu daxwaziyek wiha tune ye. Daxwaziya fêrbûna zimanê Rûsî di giraniyê de ye û pirî caran miletên din zimanê xwe naxwînin, Rûsî dixwînin. Ku mirov Rûsî bixwîne hemû rê ji mirov re vedibe".

Li hemû komarên YKSS du dibistan hene. Yek dibistana komarê bi xwe ye û ya din jî dibistana Rûsî ye. Dihat gotin ku van demên dawî ji dibistanên Rûsî re raxbet kêm bûye.

### Ma ciyê ku hûn lê diminin dizî heye yan na?

Li gundê Akbastayî yê sohbetek pir entresan di navbera min û gundiyekî de derbas bû. Gundî kete milê min û ez kişandim aliyekî û got;

-Kekê Hesen, ma ciyê ku hûn lê dimînin dizî lê heye yan na?

Min jî bêyî ku lê bifikirim got;

-Belê, helbet dizî heye. Ma însan tev ne wek hev in, diz jî hene, tolaz û serserî jî hene.

-Gundî keniya û got;

-Na, kekê Hesen ez pirsa dizên adetî ji te nakim. Ez pirsa kesên ku diziya dewletê dikin ji te dikim.

Min fêm kir ku di vê pirsê de tiştên entresan hene û weke ku min fêm nekiribe got;

-Ez fêm nakim tu çi dixwazî bêjî, eşkere bêje ku ez fêm bikim.

Gundiyekî din jî nêzî me bûbû û sohbeta me guhdarî dikir. Wî got;

-Kekê Hesen, li ba me diziya adetî kêm e, lê diziya dewletê gelek dibe. Mesela ez ji dewletê ji bo xwedîkirina 10 çêlekan alîkarî distînim. Piştî salekê dibêjim yek miriye. Gundiyekî ji pezên ku ji dewletê stendiye dikare bibêje 2-3 mirine û ji xwe re li malê xwedî bike.

### Nîvê şevê govenda bi dehol û zirne li ber otêlê

Di şeva 19.11.1990'î de kek Azîz ji bo me di qerexa çiyê de li restoranekê şayiyek pêk anî. Eynî şev Nadirê Nadirov jî ji Swêdê hate Alma-Atayê û me wê şevê di şayiyê de hevûdu dît. Stranbêjê me yekî Kurd bû û ji Ozbekîstanê reviyabû hatibû Qazaxistanê. Kurdî nizanibû lê stranên Kurdî digotin. Nîvê şevê me berê xwe da otêlê. Di rê de polîs em dan rawestandin. Çend ruble dan polîsan û em berdan. Kek Azîz li hember otêlê nîvê şevê bi tevî dehol û zirne bi me govend da girtin. Otêl tev de şiyar bû, lê ne xema Kek Azîz û hevalên wî bû.

### Vegera Moskovayê

Di 20.11.1990'î de em çûn Moskovayê. Me li Moskovayê Enstîtuya Rojhilatnasiyê ziyaret kir û bi Prof. Lazarev û Hasretyan re hinek sohbet kir. Lazarev di wê baweriyê de bû ku şerê Xelîcê wê kêrî Kurda bê, lê Hasretyan li dijî şer bû.

Li Moskovayê jî bazara reş heya tu bêjî hebû. Li otêla ku em lê diman tenê perê welatên Ewrûpî û dolar derbas dibû. Keçikên ku xwe bi dolar difirotin gelek bûn.

Di 24.11.1990'î de em vegeriyan Swêdê. Berî ku ez dawiya vê nivîsa xwe bînim, dixwazim tiştekî din jî bêjim. Ji bo min pir seyr bû ku Kurdên me yên xwenda bûn li ser pîşeya (meslegî) xwe kar nedikirin. Karê din wek nivîskarî û hwd dikirin. Min pirsa vê yekê jî ji hin kesan kir. Bersîv "Dewlet teşwîq dike. Ê ku kitêbeke helbestan binivsîne perekî baş distîne" bû. Dema min ev bersîv stend, min sebeba enflasyona kitêbên helbestan jî fêm kir. ❑

## Hindik-Rindik

### XURÎNÎ

Seddam Husên, di dema îşxala Kuwêtê de, di teftîşek xwe de belavokekê belav dike, dibêje:

-Divê nobetdar gîş şiyar bin û di tetîkê de bin.

Berbangekê Seddam ji qerargeha xwe dertê û berê xwe dide nobetdarê herî nêz. Carê mêze dike bavo çi mêze ke; nobetdar sîlehê xwe daye ser telîsên tije qûm, rûniştiye destava xwe dike. Seddam dîn dibe, hema radihêje sîlehê û dike serê esker, dibêje:

-Tu îtîatî emir û qerarên eskerî nakî ha? Wê gavê ew tiştê te kiriye bi xwe da ku aqilê te were serê te!

Esker li hember vê daxwaza Seddam şaş dimîne, lê çer bike? Seddam e, ne wujdan e, ne merhemet e, gava bi emrê wî neke, wê wî bikuje. Ji mecbûrî, tiliyekê lê dixe dibe devê xwe. Tiliyek, du tilî, Seddam dibêje:

-Bes e. Lê carek din jî tu tiştekî wiha nekî! Sîleha esker didê û ji cem dide rê. Lê gava esker sîleha xwe digre, hema di cî de dixe pişta Seddam û dibêje:

-Bisekine, ji kerema xwe re yê mayî jî tuyê bixwî!

Seddam bala xwe didiyê esker ciddî ye, ku bibêje naxwim, dikare wî bikuje. Ji mecbûrî ew jî çend tiliyan lê dixe û vedigere qerargeha xwe.

Di ser vê bûyerê re çend meh derbas dibin, ordî di şer de dişkê, jê hin teslîmî mutefîkan dibin, hin jî ber bi Iraqê baz didin. Dîsa li wî ciyî molayê didin. Çavê Seddam bi wî eskerî dikeve. Ban dikê, dibêje:


-Fena ku ji dereke ez te nas dikim. Gelo tu hevaltî, ya jî merivantiyek me bi hev re heye?

Esker dibêje:

-Na, ne hevaltî û ne jî merivantiyeke me bi hev re heye. Lê heger tê bîra te, çaxa em diçûn sefera Kuwêtê me dîsa li vir mola dabû, wê sibê li vir min û te xurîniya xwe bi hev re kiribû.

*Amadekar: Z. Xamo*

## ALÎKARIYA ZAROKÊN KURD ÊN MUHACIR BIKIN!



Piştî bûyerên li başûrê welatê me, gelek dê û babên Kurd ji bona ku ji kuştinê bên parastin, zarokên xwe bi her rê û îmkana ku dibînin, dişînin derveyî welêt.

Gelek zarokên Kurd yên ji 11'an heta 16 salî bi tena serê xwe hatine Elmanya, bajarê Hamburgê. Li vir, bê cih, bê xwendin û bê xwedî li benda alîkariyê ne. Dayîra Xortan ya bajarê Hamburgê ji bo zarokên Kurd dest bi projeyeke alîkariyê kiriye.

Eger tu bixwazî li Hamburg'ê zarokekî ji van di mala xwe de xwedî bikî û mesrefa xwendinê bigrî ser xwe, yan bi şandina peran alîkariya zarokan bikî, tu dikarî li gel adres û telefonên li jêr têkiliyê deynî.

Adres

Frau Wedell
Hamburger Str 37
2000 Hamburg 76
BRD

Tel: 49-40- 29188- 2615

Adres

Yildirim
Amanda Str. 58
2000 Hamburg 36
BRD

Tel: 49- 40- 4301940

Banga ronakbîr û akademîsyenên Fransiz

## Ji bo parastina gelê Kurd

**Li Parîsê gelek ronakbîr û akademîsyenên Fransizî li dij qirkirina gelê Kurd dengê xwe bilind kirin, bi beyanek muşterek qetlîamê protesto kirin. Em beyanê li jêr çap dikin.**

Ronakbîr û akademîsyenên Firansiz ên ku navên xwe li jêr dane, pêwîst dibînin ku aghdarî bidin û bala milet bikşînine ser trajediyên ku bi serê gelê Kurd de tên.

Her wekî mirov ji aliyê mêdiya de haydar e, wesîleyên hovane yên rejîma Bexdadê gelê Kurd didine ber qirr kirinê. Biryara 688 ya Rêxistina Miletên Yekbûyî gaveke giring a yekemîn e, lê têr nake.

Di dema niha de, tenê çareya ku di warê mirovanî û siyasî de tê qebûl kirin ew e ku hemû dewlet û dezgehên navnetewî mafên gelê Kurd ên demokratîk ji bo ziman, çand, hebûna wî nas bikin.

Irène AGHION (Bibliothèque Nationale), Max ALHAU, Patrick ALLAIN (CNRS), Myriam ARMAND (Université de Tours), Marc AUGE (EHESS), Pierre-Robert BADUEL (CNRS), Jean BALCOU (Université de Brest), C. BARBEY (Université de Tours), Marc BARBUT (EHESS), Jacques BARRAU (Museum National d'Histoire Naturelle), F. BASTID (juge), Teresa BATTESTI (Musée de l'Homme), Nicole BAUDUIN (Université de Savoie), Louis BAZIN (INALCO), Nicole de BEAUVAIS (EHESS), Nicole BELMONT (EHESS), Marcel BENEZIT (écrivain), Jacques BENS, Laurence BERARD (CNRS), André BERNAND (Lille III), Carmen BERNAND (Paris X), Jean BERTOLINO (journaliste), Jean BISSON (Université de Tours), Joyce BLAU (INALCO), Laurence BOBIS (Bibliothèque Nationale), Eric BOEDA (CNRS), Charles BONN (Paris XIII), Pierre BONTE (CNRS), Patrick BOURDY (Université de Tours), Jim BROUGHAM (Université de Tours), Jean CALMARD (CNRS-EPHE), Barbara CASSIN (Collège International de Philosophie), Nina CATACHE (CNRS), Gérard CHALIAND, Dominique CHAMPAULT (Musée de l'Homme), Monica CHARLOT (Paris III), J. CHENIEUX-GENDRON (CNRS), S. Emmanuel CLANCIER (écrivain), Jean COHEN (Paris I), Francis CONTE (Paris IV), M. COUDERC (Université de Tours), Françoise COUSIN (Musée de l'Homme), Eliane DAPHY (CNRS), Annie DECHOUX (CNRS), Michel DEGUY (Paris VIII), Collin DELAVAUD (CNRS), Ariane DELUZ (CNRS), Jean DERIVE (Université de Savoie), Marie-Jo DERIVE (Université de Savoie), Hélène DESMET (IREMAM), Ghislaine DHOINE (MNHN), Jean-Pierre DIGARD (CNRS), Jacques DUPIN (écrivain), Jean DURING (CNRS), Nicole ECHARD (CNRS), Robert ELLRODT (Paris III), Michel FABRE (Paris III), Philippe FARGUES (INED-Paris), Jean-Pierre FAYE (Université Européenne de la Recherche), Charles-Henri de FOUCHECOUR (Paris III), Robert GALISSON (Paris III), René GALLISSOT (Paris VIII), Jésus GARCIA-RUIZ (CNRS), P. GARNIER (Universit[illegible]), Alain GENIN (Université de Tours), François GEORGEON (CNRS), Philippe GIGNOUX (EPHE), Ma[illegible] GRAEFF-WASSINK (Psychosociologue), Claude GRUAZ (CNRS), E. GRUENAIS (ORSTOM), Alain GUICHARDET (Polytechnique), Jeannine GUICHARDET (Paris III), Michel GUILLAU (Paris X), Eugène GUILLEVIC (poète), Claude HAGEGE (Collège de France), Françoise HERITIER-AUGE (Collège de France), Clarisse HERRENSCHMIDT (CNRS), Nategh HOMA (Paris III), René HONVAULT (CNRS), Bernard HOURCADE (CNRS), Jean-Pierre JAFFRE (CNRS), Christian JAMBET (Collège International de Philosophie), Robert JAULIN (CNRS), Betsy JOLAS (Conserv. Musique), Jean JULIVET (EPHE), Claude-Claire KAPPLER (CNRS), Esther KATZ (ORSTOM), Paul KESSLER (CNRS), Jacques LACARRIERE (écrivain), Jean LACOUTURE, Marie-José LAJOUS TROIN (Médecin-Tours), Jacques LAMBALAIS (juriste), Danièle LAVALLEE (CNRS), Gilbert LAZARD (Membre de l'Institut), Pierre LECOQ (EPHE), Claude LEFEBURE (CNRS), Jacques LE GOFF (EHESS), Jacques LEGRAND (INALCO), Gérard LENCLUD (CNRS), Benadette LIZET (CNRS), Jean-Jacques LUBRINA (Ministère chargé de l'Action humanitaire), Anne LUXEVEAU (CNRS), François-Bernard MÂCHE (Compositeur), Anne MARCHENAY (CNRS), Philippe MARCHENAY (CNRS), Jacques E. MARTIN (Université de Tours), Henri MESCHONNIC (Paris VIII), Juliette MINCES (écrivain), André MIQUEL (Collège de France), Dominique NOGUEZ (écrivain), Rosa OLMAS (CNRS), Norman PALMA (Paris VIII), Joseph PARISI (CNRS), Mireille PARIS (CNRS), Robert PARIS (EHESS), Liselotte PASQUES (CNRS), Gilles PERRAULT (écrivain), Michelle PERROT (Paris VII), François POPLIN (CNRS), Jean POUILLON (Laboratoire d'Anthropologie Sociale), Olivier REVAULT D'ALLONNES (Paris I), Maxime RODINSON (EPHE), Olivier ROY (CNRS), Gabriel SAAD (Paris III), Mahmoud SAMI-ALI (Paris VII), Laurent SCHWARTZ (Paris VII), Jean-Noël SEGRESTAA (Paris X), Daniel SEPTFONDS (INALCO), François SIGAUT (EHESS), Pierre SIGAUT (Tours), Brigitte SIMON-HAMIDI (INALCO), André STIL (Académie Goncourt), Léon TABAH (EPHE), Claude TARDITS (EPHE), Nicolas TERTULIAN (EHESS), Solange THIERRY (EPHE), Nada TOMICHE (Paris III), Alain TOURAINE (EHESS), Jean-Louis TRIAUD (Paris VII), Jean-François TROIN (Université de Tours), Pierre TROLLIET (INALCO), Jacqueline VAISSIERE (Paris III), Jean-Pierre VERNANT (Collège de France), Pierre VIDAL-NAQUET (EHESS), Anne ZELENSKY.

## Li Tirkiyê 1'ê Gulanê di bin êrîşa polîsan de hat pîroz kirin




*Îsal jî 1'ê Gulanê di bin êrîş û zordariya dewleta Tirk de hat pîroz kirin* (Foto: Armanc)

**Turcel Dîlan/ Stenbol**

Îsal jî 1'ê Gulanê di bin êrîş û zordariya dewleta Tirk de hat pîroz kirin. Berî 1'ê Gulanê li gelek bajarên Tirkiyê û Kurdistanê tedbîrên emnî hatibûn stendin. Li Stenbolê polîs meydana Taksîmê, kiribû bin kontrola xwe û nehîştin kes têkeve meydanê.

Li Stenbolê li gelek ciyan bi tevgerên cur be cur 1'ê Gulanê hat pîroz kirin. Di nav van de tevgera herî girseyî li Seraçxanê çêbû. Ev meş ji alî Platforma 14 kovarên pêşverû û sosyalîst ve hatibû organîzekirin. Wexta meşê dest pê kir ji her alî ve gelek kes beşdarî meşê bûn û gelek ji wan ji bo kêmasiya organîzasyonê di meşê de cî negirtin û ji alî polîsan ve hatin belavkirin. Meş, gelek caran ji alî polîsan ve hate sekinandin û di navbera meşvanan û wan de şerê kevir û daran dest pê kir. Di vî şerî de 3 polîs hatin birîndarkirin. Meşvanan, barîkata polîsan perçe kirin û gihîştin pira Unkapan. Îcar ji ji hêla Teksîmê û Şîşxaneyê gelek polîs hatin û pêrgî li meşvanan girtin û êrîşî wan kirin. Îcar meşvanan berê xwe dan Emînoniyê. Li ser vê, polîs dîsa êrîş bir ser wan û dîsa di navbera polîs û wan de şer derket.

Xwendevanên kovara Medya Guneşî bi aktîfî beşdarî meşê bûn. Wan, li ser ala Kurdistanê "Roja Medya" nivîsandibûn û li pêşiya meşvanan dimeşiyan.

Roja 1'ê Gulanê li Stenbolê 2000 kes ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Xeynî 55 kesan yên din eynî rojê hatin berdan. ❐

## Guftûgoyên otonomiyê...

Barzanî de çûn Iraqê û bi berpirsiyarên hukumeta Iraqê re rûniştin. Li ser gufûgoyan, Mesûd Barzanî di 17'ê Gulanê de beyanek da. Li gor beyana M. Barzanî hukumet û Cephe, li ser "efûya ji bo Kurdan, afirandina zagoneke(anayasayeke) demokratîk, cihêkirina Partiya Baas û dewletê, demokrasî li Iraqê, garantiya qebûlkirina mafên însanî, sîstema pirpartîtî û di demeke kurt de hilbijartina parlamentoyê" li hev kirine. Barzanî di dawiya beyana xwe de got ku" em bawer in ku hukumeta Iraqê wê çavdêriya hêzên NY ji bo ewlakariya Kurdan qebûl bike." (Pêşniyariya Cepha Kurdistana Iraqê ji bo otonomiyê em di rûpelên ortê de cûda çap dikin.)

Di van rojên dawiyê de tê gotin ku li ser sê xalan Cephe û hukumeta Iraqê li hev nakin. Yek jê li ser tespît kirina sînorên Kurdistanê ye, duyem; vekişandina eskerên Iraqê ji Kurdistanê ye û sêyem jî mesela Kerkûkê ye. Lê heta rojnama me ket çapê tiştekî konkret ji guftûgoyan derneketibû. Guftûgo çiqas direj dibin endîşê jî evqas zêde dibin. Meriv bibêje nebêje ji xwe dipirse, gelo Seddam dixwaze dîsa ji xwe re wextê qezenc ke û dîsa aqîbeta 74'a neyê serê Kurdan? Yan jî maçîkirina Talabanî û heyeta serokên Kurdan bi Seddam re nebe maçîkirina mirinê.

Îro firsetek tarîxî ketiye destê Cepha Kurdistana Iraqê. Dewleta Iraqê gelek zeîf e û herî muhîmtir ew ji cîhanê îzole bûye. Û wer xwiyaye heta Seddam li ser hukum be wê Ewrûpî û Amerîkî ambargoya aborî ji ser Iraqê ranekin. Ji aliyê din li cîhanê ji gelê Kurd re sempatiyek çêbûye û mesela wî ya adîl baş hatiye nasîn. Gelo Kurd û berpirsiyarên wan wê karibin çiqasî ji vê îmkanê fêdê bibînin û vê momentê rûmet bikin. Di siyasetê de hostatî di demên wiha de îspat dibe.

## Galayek muhteşem ji...

Di konserê de surprîza herî mezin kişandina ala Kurdan û derketina Şivan Perwer bû. Di dawiya konserê de komek Kurd, alek mezin a Kurdan li sahneyê vekirin. Û Şivan jî li pêş vê alê, bi dengê xwe yê şîrîn muzîka Kurdî bi milyonan da guhdarîkirin. Berî temambûna konserê, mesaja Mesût Barzanî ji alî xortekî Kurd ve hat xwendin. Mesût Barzanî, di mesaja xwe de sipasiya kesê organîzator, dengbêjên beşdarên konserê û alîkariya enternasyonal dikir û digot "piştî ku hûn bi me re ne emê bi ser kevin".

❐ Li alî din li Swêdê jî konsereke bi vî rengî ji bo piştgiriya Kurdan di 26'ê Gulanê de li Stockholmê bi alîkarî û organîza Komîta Swêdiya ji bo Piştgiriya Gelê Kurd hate çêkirin. Di organîzekirina vî karî de keda endamê komîtê, dostê gelê Kurd û artîstê bi nav û deng Gösta Ekman gelek bû. Di vê galayê de bi hezaran Swêdî û Kurd ji bo piştgiriya gelê Kurd wek temaşevan beşdar bûn. Di vê galayê de jî gelek dengbêjên Swêdî yên meşhûr, wek Börje Ahlstedt, Stina Ekblad, Ingvar Kjellson, Max von Sydow, Jarl Kulle, Margaretha Krook, Sven Wolter, Tommy Körberg, Lill Lindfors, Lasse Brandeby, Benny Andersson, Owe Thörnqvist, Irene Lindh, Olof Buckard, Anita Björk, Lasse Berghagen, Hasse Alfredson beşdar bûn. ❐

# "Kurdan"

**B. Nazê**

Carna pirsên wiha têne kirin. Bêjeya "Kurd" di haletê pirhejmarê de, bi zimanê Erebî dibe "Ekrad", lê bi zimanê Kurdî çawa dibe?

Hin pêre-pêre bersîvê didin. "Kurdan" Dibe ji ber vê şaşîtiyê be, merovekî navê kitêba xwe kiribû "Kurdan". Gelo çima şaşîtiye? Çimkî di zimanê Kurdî de haletên taybetî hene ku nav forma pirhejmarê distîne. Û nav bi tena xwe, bêyî ku derbasî hevokekê bibe, nikare forma pirhejmarê bistîne. Li gel wiha jî nav her tim forma pirhejmarê nastîne. Gelo em çilo dizanin ku bêjeyek pirhejmar e yan yekhejmar e? Li gora ku ez pê dizanim, ev çend haletên ha di zimanê me de hene.

1- Bi alîkariya fiêlê(verb)ê netêper (intransitiv), yanî fiêlê ku obyektê nastîne. Wek nimûne:

Xwendevan hatin

Di vê hevokê de, em dibînin sûbyekt(xwendevan) bi forma xwe yekhejmar e, lê veqetondoka (in) ya fiêlê pirhejmar e. Ji ber vê yekê em dizanin ku xwendevan ne yek e, lêbelê ji yekî pirtir in.

2- Bi alîkariya tewandina sûbjektê, di hevoka fiêla têper de(fiêla ku obyektê distîne)

Wek nimûne;

Şagirtan rojname xwend.

Li vira em dibînin ku sûbyektê forma(an) pirhejmarê stendiye. Bi vê yekê em dizanin ku ji şagirtekî bêtir, rojname xwendine.

3- Bi riya sifet û mewqûfê(xislet û merovê ku xisletê wî belû bûye)

Wek nimûne;

Zarokên spehî

Di vir de, forma pirhejmarê "ên" e. Û bi vî hawayî em dizanin ku ne zarokek e, lêbelê pirr in.

Tiştekî balkêş e ku di zimanên Rûsî û Erebî de sifet û mewqûf di hejmarê de û di zayendê de li hev dikin. Yanî ku mewquf pirhejmar be, sifet jî wilo ye. Û di zayendê de heger mewquf nêr be, sifet jî vê formê distîne.

Lê belê di zimanê Kurdî de, tenê forma mewqufê tê guhertin.

Wek nimûne;

Keça spehî

Xortê spehî

Di vir de, di mesafê de, veqetandeka "a" ji bo mê ye û veqetandeka "ê"ji bo nêr e. Lê sifetê "spehî" di her du haletan de wek xwe ma.

Eger em her du nimûnan ji bo haletê pirhejmarê jî bi kar bikin, êdî emê bibînin ku dîsa tenê mewquf forma pirhejmarê distîne û sifet nayê guhertin.

Keçên spehî

Xortên spehî

4- Bi riya îzafetê. Di vî haletî de, navê mûzaf û yê lê îzafkirî dikarin forma pirhejmarê bistînin.

Wek nimûne;

Keçên Kurdan

Di vir de, em dibînin ku navê muzaf "keçên" û navê temyîz yê lê îzafekirî "Kurdan", herdu di forma pirhejmarê de hatine.

Bi xwe ez pê nizanim, ji bilî van çar haletan, ku haletên din ên pirhejmarê di zimanê Kurdî hene. Ji ber vê yekê ez fahm nakim, ev forma pirhejmarê ku piraniya Kurdên me li Ewrûpa, di nivîsên xwe de bi kar tînin, çi ye û ji ku hatiye.

Wek nimûne;

Newroz cejna Kurdan e.

Mala bavê min mala mêran e

Hevoka pêşî em di pirtûk û rojnamên me de yên ku li Ewrûpa dertên dixwînin. Û hevoka din, em di strana Şivan de dibihîzin.

Pirs; gelo çima "Kurdan e" û "Mêran e?" Forma vê pirhejmarê ji kîjan haletî hatiye? Bi xwe ez haletekî wiha di zimanê Kurdî de nas nakim. Gelo ew ji ber zimanên biyanî hatiye girtin? Heger bersiv erê be, êdî em heq didin wî merovê ku dixwest navê kitêba xwe bike "Kurdan".

De emê vegerin ser nimûna "Newroz cêjna Kurdan e" û emê wê di diyalogê de bi awayê pirs û bersîvê bi kar bînin:

- Newroz, cejna kê ye?
- Ya Kurdan e.

Dîna xwe bidin pirsê! Em di pirsa xwe de nabêjin. "yên kêne?" Lê em dibêjin "ya kê ye?"

Êdî li gora pirsê pêwîst e mirovê Kurd, bersiva xwe wiha bide;

Ya Kurda ye.

Emê niha jî di şûna nawan de, pronavan bi kar bînin:

- Ya kê ye?
- Ya me ye.

Gelo li ser vê pirsê em dikarin bibêjin " ya me ne?" Na. Lê çima hin heval di haletê nav de "Kurdan e" bi kar tînin?

Û nimûneke din;

Mala bavê min, mala mêran e.

Dîsa pirs: ya kê ye?

Bersiv- ya mêran e.

Çima ne mêra ye?

De ka em bi pronavan bi hev re bipeyivin.

- Ya kê ye?
- Ya me ye? Di haletê yekhejmarê de
- Yên kê ne?
- yên me ne? Di haletê pirhejmarê de.

Hûn dîna xwe didin pirsa di haletê yekhejmarê de, bersîva wê bi yekhejmarê tê û di pirsa pirhejmarê de, bersîv bi pirhejmarê tê.

Lê em, çima di herdu nimûnan de li ser pirsa yekhejmarê, bersîva pirhejmarê didin? Tenê tê fahmkirin ku ev tişt ji ber zimanên din hatine girtin.

Bi Swêdî, Erebî û Rûsî "Kurdan" forma pirhejmarê bêyî ku di hevokê de be, distîne. Û ne dûre ji ber vê yekê jî "Kurdan e" û "mêran e" têne gotin. Lê ku em li gora zimanên biyanî hevokên xwe deynin, êdî pêwîst e em di şûna "keçên spehî hatin" de bibêjin "Keçên spehinin hatin" û hevoka dawî her Kurd pê dizane ku şaş e.

Bi xwe min pirsa hewoka "Newroz cejna Kurdan e" ji gelek hevalan kir. Lê di ravekirina xwe de, wan qîneta xwe bi min neanîn. Û di nerîna min de, gava ku Kurd dibêjin "Kurda ye" ne ji ber ketina "n" ê ew wiha dibêjin. ❑

# Ferhenga Lîteratûrî

**Amadekar Bavê Nazê**

### Feyleton

Feyleton ji gotina Fransî feuilleton hatiye. Bi xwe ev formek ji formên nivîsa nîv edebî ye. Ew bi xebata rojnamegeriyê ve girêdayî ye. Destpêka hebûna xwe (1800 li Fransayê) feyleton bi armanca rewaca rojname û kovaran dihate nivîsandin. Îro qalibên feyletonê yên standart hene; berî her tiştî divê ev li ser bingehên faktên ku di riyalê de hene bête avekirin. Nêrîna nivîskar, li ser wan faktan, pêwîst e xweş belû be. Çimkî ew li gora baweriya xwe, faktên ku hene bi rengên pêkenînê pêşkêşî xwendevanan dike.

Wek adet, feyleton ji çend têman pêk tê. Nivîskar ji dûr ve berê xwe dide têma xwe ya bingehîn. Ji ber vê yekê, ew di çend têmên din re derbas dibe heya ku digihê armanca nivîsa xwe. Helbet pêwîst e ku çerçewa nivîsê hemû têman qebûl bike û hemû bi ya bingehîn ve girêdayî bin.

Nivîskar, di nivîsa xwe de elementên henek û qerfan bi kar tîne. Bêyî van rewiştan feyleton xusûsiyeta xwe winda dike, êdî wê nikaribe bi dilêma(wezîfa) xwe rabe. Di rojnamên Kurdî de, li gora agehdariya min, quncikê "Striyên Me" di rojnama Armancê de,ji vî rengê nivîsê dest pê kir.

### Lîteratûrnasî

Têrmîna "lîteratûrnasi"yê, ne ji mêj ve derbasî ferhenga lîteratûrî bûye. Li gora tê zanîn, ew li Almanya, di destpêka sedsala 20'an de hate meydanê. Bi zimanê Almanî jê re tê gotin; "Lîterraturwissenschaft".

Lê nayê wê manê ku ev ilmê ha ji nişkave çêbû. Hîn di lêkolînên dema ronakbîrên Yûnan û Roma kevnar de, li ser edeb û hunermendiyê bingehên ilmî peyda bûbûn. Wek numûne Arîstoteles û fîlosofên wî heyamî yên din, qebûl dikirin ku lîteratûra wek rengên hunermendiyê yên din, teqlîda jiyanê dike û li ser bingehê zagonên pêwîstî û îhtîmalan tê efirandin. Berhemên ku bi vî rengî têne afirandin, ne tenê marîfetê dide xelkê, her wiha xweşiyê(mûtetê) jî bi wan re vedijîne û giyanê wan paqij dike.

Wan fîlosofan, ne tenê pirsên li ser xusûsiyeta lîteratûra û rola wê ya civakî danîn. Wilo jî wan edeb teqsîmî li ser cins û rengên lîteratûrî kirin.

Îca lîteratûrnasî çi ye? Eger bersîv bi kurtayî be, wê bê gotin ku ew ilmê li ser her aliyên edeb e. Lîteratûrnasî bi xwe li ser esil, rewişt, pêşketinên dîrokî, pêwendiyên civakî, bingeh û dilêma lîteratûrê radiweste. Her wiha ji ew li gora serdemê teqyîma wê dike.

Bi xwe sê beşên lîteratûrnasiyê hene:

1- Tiyatroya lîteratûrî; Ev beşa lîteratûrnasiyê tehlîla xusûsiyeta edeb wek formek ji formên xebata însan a giyanî, dike. Ew zagonên pêşketina edeb ders dike. Her weha ew xusûsiyeta avakirina berhemê ji hev derdixe. Bi gotineke din, ew karakterê berhemê edebî û prensiba lêkolîngeriyê dide nasîn.

2- Beşa duyem ya lîteraturnasiyê dîroka lîteraturê ye. Ew li ser prosesa pêşketina lîteratûra cîhanê û yên netewan yeko-yeko hûr dibe. Ew dide xwiyakirin, edeb di çi qonaxan re derbas bûye û rewiştên her qonaxekê bi me dide nasîn. Û her weha babetê dîroka lîteratûre dikare bibe berhemên hin nivîskaran.

3- Rexnegirî. Rexnegirî (Kirîtîka) li Yûnanê di qonaxa çanda êlînistî de peyda bû. Gotina "Kirîtîca" bi mana teqyîmê tê. Bi xwe bi mefhûmê xwe nêzî hukumlêkirinê ye. Lê rexnegîrî bi mana xwe ya fireh -ew teqyîma li ser hemû diyardeyên(zahîrên) xuristê, civakê, zanyarî û hunermendiyê ye. Lê belê rexnegiriya lîteraturî di pêşketina dîrokî de, mefhumekî xwe yê taybetî heye. Helbestvanê Rûsî yê mezin A. Pûşkîn bi vî rengî rexnegiriyê ji me re dide nasîn: "Rexnegirî ew ilim e yê ku spehîbûn û kêmasiyan berhemên edebî û hunerî, xwiya dike."

Herçî rexnegir, bi tenê li ser bingehê zanebûneke kûr ji qanûn û diyardayên civakî û hunerî, dikare teqyîmek rast û durust pêşkêşî xwendevanan bike. Û li gora rexnegirê Rûs Bilînskî; "Rexnegirî estetîkek bi bizav e. Ew muhawele dike ku; rol û girîngiya hin diyardayên lîteratûrî, di serdemê de bide xwiya kirin."

Lîteratûrnasî, li gora mefhûmê xwe, pêwendiyên xurt bi estetîkê wek ilmê giştî ji bo têgihiştîna cîhanê bi awakî fenî, heye.

# ne karê aqila ye lê rast e

**Amadekar: Hesen Mizgîn**

◆ Di rojên dahatû de şopa tiliya mirovî wê ji bo îspatkirina huviyeta mirov têr bike. Şopa tiliya mirov ji alî datayekê ve tê xwendin. Ev tê wê manê ku di dahatûyê de hewcedariya mirov ji kartên bankê re namîne û sextekariya bikaranîna kartên bankê wê ji holê rabe.

**◆ Operatorên ku îro bi kêrikan ameliyat dikin, hêdî hêdî terka bikaranîna kêrikan dikin û di ciyê kêrikan de tîrêjên laserê bi kar tînin. Di bikaranîna tîrêjên laserê de şopa ameliyatê namîne.**

◆ Îzlandiyan makîneyeke nû çêkirine. Ev makîne, berfa li ser rê di demek pir hindik de paqij dike. Makîne li kamyonekê tê monte kirin û di saniyekê de 25 $m^3$ berf dide aliyekê.

**◆ Li Brîtanya Mezin di salekê de 550 milyon heywan ji bo xwarinê tên serjêkirin.**

◆Tûtiyên (papaxan) herî mezin li Zelanda Nû dijîn û tenê 43 tene mane. Ji van 43 tutiyan 15 nêr û yên din mê ne.

**◆Dema mirov bezelye û hêşînayiyên ji cinsên bezelye tevî kartolan diçine, heywanên wek kurm, kêzik û hwd nikarin zirarê bidin kartolan. Lêkolînerên Brîtanî niha dixebitin ku gena bezelyeyê derbasî kartolan bikin.**

Li hin herêmên Nepalê, ji %50'yê zarokan berî ku pênc saliya xwe temam bikin, dimrin.

www.arsivakurd.org